

PEYAMA Kurd


Hejmar 44 | 08.07.2005

Kurdish weekly newspaper

Mandelayê Kurd Xenî Bilûryan:

“Xanima min Merze digot: ‘Ez amademe cenazeyê te wergirim, lê naxwazim bibînim ku tu liser ekranên televizyonan bibêjî ku ez poşman bûme”

Rûpel 8



Esad li riya revê digere!

Bîrîl ji amadevanan re got: “Hûnê dîrokê di vê hotêlê de çêbikin”

Rûpel 10

Kerkûk Kurdistan e !..

Emrîka û hevpeymanên wê jî îtiraf pê kiriye!

Rûpel 6



Bi balafirên
Volks Wagenê ber bi
RIO rêwîtiya zewqê

Rûpel 2

Profesor Brijder
Nemrûdê restore dike

Rûpel 3

Kurdino berê xwe
bidin Lozanê û lanetê li
peymanê Lozanê bînin!

Rûpel 5

Rojnamevan Ikram
Oguz hat girtin

Rûpel 4

Ikram Oguz
Şahiyeke çandî û civakî:
Dawet

Rûpel 12

Amerîka:
Welatê herî oldar

Rûpel 14

Heyetî PDK û YNK
bi Komîsyonî
Qanûna amê piye
het

Rûpel 16



Rûpel 7

Li Almanyaya wêneyê Kurdan

D 1.50 EUR, A 1.70 EUR, B 1.70 EUR, NL 1.70 EUR, CH 2.60 SFR
LUX 1.70 EUR, I 1.70 EUR, S 19.00 SKR, DK 14.00 DKR,
N 16.00 NOK, GB 1.10 £, GR 1.70 EUR



4 196577 401503 44

Peter Pilz daye dû mêrkujan



PK - Parlamenter û berdevkê partiya keskan ê pirsgirêka ewlekariyê Pilz di doza vekirina lêpirsina di derbarê Ahmedinecad de israr dike.


Pilz di civinek çapemeniyê de got ku piştî raberizandinên wî yên bi parêzgerê dewletê re parêzger biryara vekirina lêpirsina di derheqê Serokkomarê Îranê Mehmûd Ahmedinecad de sitendiye.

Liser ragihandinên Pilz, di 6ê Tirmehê de Wezîra Karê Hundir a Awûsturyayê Karin Miklautsch jî beyanek çapemeniyê da û got ku tu biryara tehqîqatê di derheqê Ahmedinecad de nîne.

Liser vê daxuyanîyê Peter Pilz jî daxuyanîyek din da û got ku Karin Miklautsch wek berdevkê Serokkomarê Îranê dixave û wê bi hewldana dezinformasyonê gunehbar kir.

Wek tê zanîn Dr. Qassimlo û du Kurdperwerên din di sala 1989an de li Wîyanayê jî teref rejîma Îranê ve hatibûn kuştin û jî wê rojê û vir de Parlamenterê partiya keskan Peter Pilz hewl dide ku mêrkujan derxe ber dadgehê.


Window XP N nayê ecibandin



PK - Şîrker û dikanên kompiyûteran kirîna verziyona nuh a Windows XP tercîh nakin. Hefta buhurî Windows XP N bi zimanê Ingilîzî, Fransîzî, Îtalyanî û Îspanyolî hat pêşkêşkirin. Firotna gelemperî jî wê di rojên bê de destpêbîke. Wê jî xeynî van zimanên jorîn deh zimanên din jî lê bèn zêdekirin. Şîrket û dikanên ku kompiyûteran difroşin dibêjin ku mişteriyên wan zêde elaqê nîşani verziyona nuh nadin. Berpirsiyar û firoşerên dikanan dibêjin ku di vê verziyona nuh de tu tiştekî ku bala mişteriyên bikşîne tune. Ji aliyê din di vê verziyona nuh de Media Player tune û jî ber vî jî mişteriyên re zêde ne balkêş e.

Komîta karger ya VW sendîqevan, bi jinên Brezilî kirîne

Bi balafirên Volks Wagenê ber bi RIO rêwîtiya zewqê



Wolsburg - Skandala ruşvet ya di firmaya erebeçêkirinê Volks Wagenê (VW) de her ku diçe fireh dibe. Hefta bihuri kesek ku di VWê de kar dike û di derheqê firmayê de pir tişt dizane, çû rojnama Almanî "Süddeutschen Zeitung" û di vê derheqê de dan rojname.

Ligor agahdariyên vî kesî, komîta Karger ya Volks Wagenê (VW) bi salan sendîqevan kirîne. Ew xebatkarê VW jî rojnama Almanî "Süddeutschen Zeitung" hercarê her sendîqevan ji VW bi qasî 30 000 Euro pere

eşkere dike ku sendîqevanên IG-Metall bi balafirên VW çûne Brezilîya û li wir hemû mesrefên wan jî aliyê VW hatiye dayîn. Ligor nûçeya "Süddeutschen Zeitung" ev karê wisa bi salan di navbera komîta Karger ya VW û sendîqevanên de domandiye.

Sendîqevan bi balafirên VW çûne Brezilîyayê an jî welatên din. Ew li wir çûne cem jinan, di cihên luks de bi jinan re kêf û sefa derbaskirine. Jibo hercarê her sendîqevan ji VW bi qasî 30 000 Euro pere



girtiye. Ew perê jîbo sendîqevan koma rêvebira VW erê kiriye.

Jiber vê skandalê niha serokê karmendên VW (Personlaşef) Peter Hartz di rewşek xirab de ye. Wî di dadgehê da hemû sîc red kirin, lê wisa xuyaye ku wê Peter Hartz îstîfa bike. Serokê sendîka IG-Metall Klaus Volkert

jî jiber vê skandalê îstîfa kir. Ew demeke ne xuya bû, lê di 5ê Tirmehê de daxuyanîyek da û wî jî ew sîc red kirin. Ligor nûçeya kovara „Focus“ VW bi hezaran Euro daye Volkert û bi rindeke Brezilî ve çûye Sao Paulo tatilê. Ji ber xuyabûna vê skandalê Klaus Volkert jî îstîfa kiriye.

Li Îskoçyayê çalakiyên li dijî G8an

Londra - Di 6ê Tirmehê de civîna dewletên G8 li bajarê Îskoçya Gleneaglesê destpêkir. Serokwezîrê Îngiltere Tony Blair dixwest vê civine jîbo tekoşîna li hemberî feqîriyê bike platformek.

Di dawîya hefte de li hemû dinyayê bi navê Live 8 konser hatin organîze kirin. Ew konser di bin şîra „Deynên dewletên Afrîka paqîjkin“ hatin organîze kirin û stranbêjên bi nav û deng ku beşdarê wan konseran bûn, piştigirtiya xwe ji o afrikaiyan nîşan dan.

Meha bihurî Wezîrên aboriyê yên dewletên G8 lihev kiribûn ku 40 milyar Dolar deynên 18 dewletên feqîr paqîj bikin. Berî ku civîna G8 destpêbîke bi hezaran aligirên gloverbûna alternatîf çûn Îskoçya. Organîzatorê konserên Live 8 Bob Geldof jî çû. Bob Geldof berî ku bixe Îskoçya got „em jîbo serketinê hatin vir, dive deynên dewletên feqîr niha bèn paqîş kirin, an ew dibe bêberpirsiyarîyek mezin“.



Ji Dêrika çiyayê Mazî du malper

Dêrika çiyayê mazî li Mêrdînê yek ji navçeyên biçûktirîn e. Ligor nifûsa xwe li seranserê Kurdistanê jî ji vê taybetiya xwe ne dîr e.

Dêrik biçûke, lê jiber nasnameya xwe ya welatperwer liber çavên Kurdan mezin e.

Di warê medyaya elektronik de jî Dêrikê bi du malperan du karên heja kiriye.

www.derikli.com û www.turcel.org

Turcel.orgê jibo dîrokê gavek gelekî girîng avêtiye. Jibo hemû şehîdên Dêrika çiyayê mazî rûpelek vekiriye. Bi vî awayî bi gavek gelek di cî de hewl daye ku him wan bi me jibîrkin nede û him jî jibo nivîsandina dîrokê belgêyê ji gelê Kurd re hiştiye.


Şemdin Sakik pirtûkek din jî nivîsand

PK - Şemdin Sakik di girtgehê de piştî pirtûka xwe ya yekem bi navê „Apo“ niha jî pirtûkek bi navê „sefaleta şidetê“ pirtûkekê dinivîse.

Ligor agahdariyan pirtûka duyem jî liber qedandinê û wê di meha Tebaxê de teslîmî çapê bibe. Ji niha ve gelekî eşkereye ku Sakik di zindana Tirkan de jî xwe poşman dîsa bi dilê Tirkan ne şideta dewletek dagirker lê şideta PKKê bi yek alî dinivîse û bivir him li lingên xwe û him jî li lingên gelê Kurd dide û neheq dike. Sakik çiyê şideta dewleta dagirker û şideta PKKê diguhere û wek ku doh çawa liser bingehê vala hewldida ku gel bixşîne cem PKKê îro jî dîsa liser eynî bingehê vitûvala çirokan dibêje. Dewleta Tirk girtiyên teslîm bûne dixê halekî ji mirinê xirabtir.

Şemdin Sakik di 191 çalakiyan de pirani jê hêzên ewlekarî ji kuştina 256 kesan berpîrs hatibû dîtin û heta dawîya jiyana xwe cezayê hepsê xwaribû.

Xwezî bi cigarê



PK - Lêkolînek hat kirin û eşkere kir ku miqdara karbon monoksîta di xwîna ew kesên ku nargîlê dikşînin ji ya cigarekêşan çar cara bêtir e.

Ligor lêkolîna ku di kovara „Pediatrics“ de hat weşandin, di tûtina nargîlê de kanserojên madeyên wek nikotîn, qetran û metalên giran ji tûtina cigare gelekî zêdetir e.

Li dinyê rojê 100 milyon kes nargîlê dikşînin. Welatên ku bêtir nargîlê lê tê kişandin Tirkîye, Pakistan, Çîn û welatên Ereb in.

Her weha di raporê de hatiye nivîsandin ku di civakê de bawerîya ku nargîlê ji cigarê kêmtir bi zirare heye, lê ev ne rast e.

Profesor Brijder Nemrûdê restore dike




PK - Mamosteyê Zanîngeha Amsterdamê Prof. Dr. Herman Brijder di çarçoveya projeya Nemrûdê de ku ji aliyê Weqfa Navnetewî ya Nemrûdê (WNN) hatibû amadekirin dest bi xebata xwe kir. Nenda WNNê li Holanda ye.

Wek ku tê zanîn çiyayê Nemrûdê heystemîn heriqaya dinyê tê qebûlkin. Brijder radigihine ku jiber berf û baranê peykerên qralan zîrar dibînin û jiber vê yekê divê di demên periyodîk de karê restorasyonê bê kirin. Brijder bi vê xebata xwe guman dike ku bi restorasyonê baş hemû peykeran wek berê bike. Her weha

Brijder diyarkir ku wê îsal cihêkî taybetî bidin xebata nûkirina peykerên zêde kevn û belav bûne.

Brijder guman dike ku Nemrûdê bigihînin nivîsên nû û weha dibêje: „Em baş dizanin ku Nemrûdê bi telûka windabûnê rûbirû ye. Nemrûdê ne mîrasek min, ya me ye, ya hemû dinyê ye. Ne girîngê ku karên restorasyonê Nemrûdê ji aliyê kêve tê kirin. Ya girîng xwedîtî li Nemrûdê kirine ku



ger ev neyê kirin heta 5-10 salan dikare winda bibe.“

30 sale bi boyaxkirinê debara xwe dike

PK - Li Wanê Ramazan Tekcan ev 30 sale bi boyaxkirina pêlavan debara xwe dike. Tekcan berî ku dest bi vî karî bike 25 salan karê restaurantan kiribû. Tekcan di ciwantiya xwe de qezeyek trafîkê derbas dike û hemû mal û milkên xwe jibo rehetbûna xwe xerc dike.

Ramazan Tekcan piştî qezeyê bê pere maye û dest bi akarê boyaxa pêlavan kiriye û debara 6 zarokên xwe bi vî karî kiriye.

Tekcan li Wanê tu kolanek nemaye ku lê kar nekiribe. Ew ji alî hemû hemwelatîyên Wanê tê naskirin û hezkirin.



Yekem nêrdewana elektronîk Geverî tirsandin

PK -- Yekem nêrdewana elektronîk li Geverê di navendek kar de ket xizmeta Geverîyan. Hin Geverî wexta ku li nêr-



dewana ku di jiyana xwe de cara yekem didîtin swar bûn, tirsîyan û ji dêvla ku liser piyan bimînin, rûniştin.

Ev awayî li herêmê mezintirîn naven-da kar e. Di avayîya ku navê Zagros Centrum lê hatiye kirin de 10 buro, marke-tek mezin û salonek şahiyê heye.

Di merasîma vekirinê de 3 hezar kes amade bûn û hin dimenên balkêş bi gelê Geverî re demên xweş derbas kir. Gava hin kesan dixwestin hilkişin jor li nêrdewana ku dadikeve jêr siwardibûn û hin kesên ku dixwestin dakevin jêr li nêrdewana diçe jor siwardibûn û derdora xwe di nav ken de dihiştin.

Jibo bîranîna Şêx Seîdê nemir li Amedê Konferansek



PK - Li Amedê ji aliyê Komela Kurd ve konferansek jibo Şêx Seîdê nemir û şehîdên serhildana sala 1925an hat lidarxistin.

Serokê Komela Kurd Ibrahim Güçlü di konferansê de axaftina xwe bi Kurdî kir û di vê mijarê de nixandînen dewleta Tirk rexne kir.

Güçlü diyar kir ku Bizava Şêx Seîd bi naverok, bi qad û firehbûn û civakî bizavek netewî ye û jiber vê yekêye ku Komara Tirkîyê û îdeologên wê bi zêdeyî liser radiwestin û dixwazin mehkûm bikin. Güçlü bi berdewamî got: „Dewleta Tirk û îdeologên wê dixwazin bi îdiayên nerast rêberên bizava Şêx Seîd sûcdar bikin. Şêx Seîd Efen-dî, Xalid Begê Cibranî û hevalên wan jibo heq, hiqûq, wekhevî û mafên gelê Kurd têkoşîn kirin û şehîd ketin. Em hustiyê xwe li ber wan xwar dikin, em dizanin ku ew bi hizûr li ciyê xwe raketine û mekanê wan bihuşt e.“

Hikmet Fidan hat kuştin



PK - Di 6ê mehê de siyasetmedarê Kurd Hikmet Fidan li Amedê taxa Baglarê bi êrişek teroristî hat kuştin.

Fidan mamosteyekî teqawitkirî bû û demek dirêj çigirê serokatiya HADEPê kiribû.

Ligor daxuyaniya bi îmzeyê Serokê Komela Dijberên Sûcên Şer Li Kurdistanê Mahmut Kiliç, "Hikmet Fidan heta darizandinên Îmraliyê nêzikî PKKê dihat xuyakirin, lê paşê wek gelek welatparêzan ew jî ji wan bidûrket."

Ligor axaftinan Fidan ji başûrê Kurdistanê vegeyriyabû Amedê.

Ev demek dirêj ku dewleta Tirk bi pêwendiyên xwe yên bi Yekitiya Ewropa re dev ji cinayetên "qesas ne diyar" berdabû.

Ger dewleta Tirk Fidan kuştibe, ev dikare wek îşaretekê be ku wê jî nû ve dest bi kuştina welatperwerên Kurd bike.

Egitim-Senê alaya teslimiyetê kişand

PK - Egitim-Senê di 4ê mehê de duyem civîna xwe ya derasayî li Anqerê lidarxist. Bi pêşniyaznameyekê ku 381 delegeyan pejirand û 151 kes li dijî rabûn, ji destûrnameya Egitim-Senê xala duyem ku perwerdeya bi zimanê zikmakî dixwest derket. Piştî eşkerebûna encama dengdanan kesên ku li dijî guherandinê deng dan, bi drûşmeyên wek, "Zimanê zikmakî maf e, nayê astengkirin", "Bêdeng nemîne, biqîre" biryar şermezar kirin.

Li Bingolê êrişê birin ser KMMê

PK - Li Bingolê (Çewlik) hin kesên qaşo nasname nediyar êrişê birin ser Komeleya Mafên Mirovan (KMM) û avahî serûbin kirin. Êrişkeran zirarên mezin dan komputer û alavên teknîkî, derî û pencere şikandin. Êriş piştî rakirina cenazeyên 5 wezîfedarên ku bi çalakîyek li dijî trênekê hatibû lidarxistin miribûn, pêk hat.

Li Amedê şîdeta li ser jinan zêde ye

PK - Li Amedê ji aliyê Navenda adaptasyon û rehabilitasyonê xizmetên civakî (SOHRAM) ve bi mexdûrên ku serî li navendê dane anketek hat lidarxistin. Lêpîrsîna ku bi 80 kesî re hat kirin eşkere kir ku li Amedê di malbatan de şîdeta li himber jinan ji texmînan zêdetir e. Ligor pisporan lédana jinan ne tenê pîrsgirêkek fîzîkî ye, her weha bi xwe re tehrîbatên psikolojîk tîne holê û gelek caran di temamiya jiyandê de bandorên xirab liser mirov dike.

Li Amedê serlêdanek balkêş



PK - Li Amedê Muharrem Bulduk bi gazindek balkêş serî li Komeleya Mafên Mirovan (KMM) da. Bulduk dibêje ku jiber hêwirzayên (deng-qelbalix) balafiran bi şev nikare rakeve û ditirse. Bulduk îdia

dike ku divê balafirgeh derkeve derveyî bajêr û weha dom dika: "Ligor standart û normên netewî û navnetewî divê balafirgeh li derveyî bajêr be. Hêwirzayên balafir derdixin bandorek neyênî liser tenduristiya gel

dike. Em dixwazin ku ev rewş bê serrast kirin. Ev ne pîrsek ferdî lê civakî ye. Zarokên min jî jiber balafiran nikarin dersên xwe bixebitin û rakevin."

Bulduk ragihand ku jiber ku hin şevan balafirên şer gelekî

radibin û dadikevin ew dikevin nav endîşeyan û psikolojiya wan xirab dibe.

Her weha Bulduk eşkere kir ku wî li gel KMMê serî li Barroya Amedê û Weqfa Mafên Mirovan ya Tirkiyê jî daye.

Dewleta Tirk cenazeyên şervanên kurd teslîm nake



PK - Komeleya Mafên Mirovan (KMM) bi daxuyaniyekê eşkere kir ku dewleta

Tirk cenazeyê şervanên Kurd ku li Hezêxê di şerekî de hatibûn kuştin radestî malbata wan nake û di hêla ku birize. Ligor agahdariyên serokê KMMê Selahattin Demirtaş di şerê 24ê Heziranê de sê şervanên PKKê bi navên Maşuk Altug, Kemal Ismailoglu û Zahide Kurt hatibûn kuştin, lê heta niha jibo stendina cesedan hemû hewldanên malbatên wan bê bersiv mane. Serdozgeriya Hezêxê îdia dika ku dewletê cesed bi dest nexistiye, ligel vê yekê tu bawerî û alîkarî nade ku malbatên Kurd bi îmkanên xwe li herêma pevçûnê li zarokên xwe bigerin. Demirtaş ragihand ku dozgeriya Hezêxê ji wan re diyar kiriyê ku mafê leşkera heye ku li wê herêmê lêgerîna malbatan asteng bike. Demirtaş bi berdewamî got: "Piştî ku li herêmê pevçûn zêdebûn ihlalkirina mafên mirovan jî pîr zêde bû."

Ji bo stendina tezmînatê 6 hezar serlêdan

PK - Li Mêrdînê heta niha 6 hezar kesên ku jiber şer mal û erdên xwe terkkirine, jibo stendina tezmînatê serî li saziyên dewletê dan.

Di sala bihurî de dewleta Tirk jibo "çareserkerîna" vê pîrsê yasayek derxistibû. Ligor daxuyaniya walîtiya Mêrdînê heta niha ji 6 hezar serlêdanan dosyaya 266 kesan hatiye xwendin û ji wan jî 15 kesan bi tevayî 100 milyar Lîre wergirtine. Ligor agahdariyên resmî yên dewleta Tirk li Mêrdînê 129 gund hatine valakirin û 14 kes mecbûr mane ku mal û erdên xwe terk bikin.

Serlêdana tezmînatê wê di 27.07.2005an de bi dawî bû.

Ji aliyê din ve hat ragihandin ku jibo wêrtirina tezmînatê hejmara serlêdanêrên li Muşê gihast 7 hezar û 237 kesan.

Li Muşê jî heta niha 40 dosya hatiye qebûl kirin û ji wan jibo 30 dosyayî dewlet divê 138 milyar 803 milyonî bide.


Rojnamevan Îkram Oguz hat girtin

Xwedanê rojnameya Azadî İkram Oguz di 6ê Tirmehê de li balafirgeha Îstanbulê hat girtin.

PK - İkramettin xwedanê rojnameya Azadî bû û jiber cezayên lê hatibûn birin ji Tirkiyê derketibû. İkram Oguz bi qasî deh salane li Almanya dijî.

Oguz carina jibo rojname me (Peyama Kurd) jî dinivîsî. Ew piştî deh salên li koçberiyê roja 6ê Tirmehê vegeyriya Tirkiyê û li balafirgeha Ataturk ji teref polîsan ve hat girtin.

Jiber ku cezayên wî bi berêfîyê ketine, bawerî ewe ku ewê di demek kin de bê berdand.



Du penaberên Kurd di kamyonekê de fetisîn

PK - Polîsên bajarê Vicenzayê ragihand ku di kamyonek awûstûryayî de laşên du penaberan dâtine ku ligor texmîna wan ew herdu Kurdên başûr in. Ligor agahdariyan çar penaber li Yunanistanê li kamyonê siwarbûne û xwestine bîna Îtalyayê. Ligor agahdariyên polîs kesên mirî jî germê fetisîne. Polîs dest danîyê ser kamyonê û şofêrê wê jî hatiye binçavkirin.

Kurdino berê xwe bidin Lozanê û lanet li peymanana Lozanê bînin!

PK - Di pêşengiya Komelaya Alliance Des Kurdes de Kurd, jibo lanetlêkirina peymanana Lozanê wê li Swîsrê bajarê Lozanê di 24ê Tîrmeh de bimeşin.

Welatên rojava di sala 1923an de jibo parvekirin û tesfîyêkirina împaratoriya Osmanî li Lozanê peymanek lidarxistin û erdê împaratoriya Osmanîyan, liser navê avakirina netewewewletan di nav dewlet-neteweyên çêkirî de parve kirin. Di vê parvekirinê de jibo berjewendiyên emperyalîst li bajarê Swîsrayê, li Lozanê peymanana Lozanê hat çêkirin û ligor vê peymanê hebûna Kurdan hat înkarkirin û welatê wan Kurdistan jî di nav çar dewletên çêkirî de (Tirkîya, Iran, Iraq, Sûrî) hat parvekirin.

Kurd li dijî vê peymanana emperyalîst/dagirker derketin. Di

her perçeyên Kurdistanê de Kurdan li dijî emperyalîstan û dagirkeran ala serxwebûnê rakirin. Jiyana serokê Kurdan Mistafa Barzanî ya 74 salan bû sembola berxwedana netewa Kurd. Jiyana Mistafa Barzanî têrî bidestxistina serxwebûna Kurdan nekir û qediya. Lê doza Kurdan a serxwebûnê bi jiyana Mistafa Barzanî re dawî lê nehate. Wî doza Kurdan emanetî du kurên xwe kir: Idrîs Barzanî û Mesûd Barzanî û Mesûd Barzanî iro alaya serxwebûnê lipêş Kurdan hildigire.

Piştî şerê Iraqê li Iraqê xe-lekek zîncîra Lozanê şikest. Kurd hewl didin ku wê zîncîrê jî binîve bişkîne û xwe jî wê rizgar bikin. Jiber vêya jî Kurdên Ewrûpayê li ciyê ku ev zîncir xistin hustuyê Kurdan tèn cem hev û lanetê li wê zîlmê dikin.

Bi vê mijarê Alliance Des Kurdes di 24.07.2005an de li Lozanê meş û xwepêşandinekê lidar dixê. Berdevkê Komeleyê Rojhat Badîki bersîvên pirsên Peymana Kurd da û eşkere kir ku jibo beşdarbûnekê berfireh wan serî li hemû sazî û dezgehên Kurdî dane û piştigiriya Kurdan dixwazin. Badîki got: "Ev doz, doza me hemû gelê Kurd e û pêwîstê em Kurd bi yek deng û bi yek helwest li dijî peymanana Lozana koletiyê derkevin û rênedin nijadperest û faşîstên Tirk Li Lozanê xwepêşandan pêk bînin." Badîki got, "pêşketin û serketinên Başûrê Kurdistanê tirs û xof xistiye dilê dewleta Tirk" û dom kir: "Jiber vê yekê dewleta Tirk dixwaze li Lozanê jibo parastina peymanana Lozanê xwepêşandin û konferansan amade bikin."

Dewleta Tirk dijminatîya Kurd bi destê Kurdan dide kirin

Serokê partiya faşîstên Tirk (Partiya Bizava Neteweperest-MHP) beşê Amedê Abdullah Arzakçi yê bi eslê xwe Kurde got ku neteweperestiya Tirk şeref e.

Li bajarê Adanayê serokên 17 bajarên Kurdistanê yên MHPê di 22 Hezîranê de jibo li Kurdistanê bêtir bi cih bibin di navxwe de civînek lidarxistin.

Arzakçi di axaftina xwe ya civînê de eşkere kir ku neteweperestiya Tirk şerefê û got: „Li Diyarbekira ku heta doh 3-4 kes nikaribûn bèn gel hev û bêjin em MHPyî ne, niha di rêvebiriya partiya me de 50 karmend hene û bi deh hezaran jî endam hene.“

Arzakçi ragihand ku ew 14 sale di nav MHPê de cî digire û jî 2.5 salan virde serokatiya bajêr dike. Arzakçi got ku ew dixwazin di hilbijartinên pêşiya me de jî Diyarbekirê parlamen an parlamenan derxînin û weha dom kir: „Ev jî wê jî Diyarbekir bi qewirandina taşeronên (serkar) welatên derve pêk bê. Ev li bizava me dikeve.“

Li Amedê dewleta Tirk jî hatina rêvebir û berpirsiyarên res-



mî û dezgehên siwîl yên Ewrûpî her nerazîbûna xwe diyar dike. Vê carê hevî dike ku vî karî bi „xwefiroşên“ Kurd bide kirin û encaman werbigire.

Arzakçi gazîndan dike ku rêxistina wan li Kurdistanê nîkare jî gel re îfade bike ku ew „ne dijminê Kurdan e“. Arzakçi wek ku bi salane dewleta Tirk dike ew jî Zaza û Kurd jî hevdu cuda dike û dibêje: „Diyar min zaza û bavê min Kurd e. Li gorî min li vî welatî pîrsa Kurdî nîne. Li bajarekî xwedî 574 hezar hilbijêr e serokatiya partiyek ku jî sedî 1-2 deng stendiye ne hêsan e. Lê di hilbijartinên pêşiya me

de hedefa me stendina jî sedî 15-20 deng e. Niha 6 hezar û 110 endamên me hene. 30 hezar kesî jî jibo endametiye serî li me dane. Hedefa me ewe ku em li Diyarbekirê 120 hezar deng bistînin.“

Dewleta Tirk bi xwefiroşên ku qaşo nasnameya xwe ya netewî înkâr nake û bêtirs dibêjin „ez Kurd im“ dixwaze Tirkîtiyê bike û li Kurdistanê bi cih bibe.

Herweha dewleta Tirk hewl dide ku hemû eşîretên parêzgerên gundan bi pere û îmkânên mezin li MHPê bicivînin ser hevdu û bi Kurdan dijminatîya Kurd bide kirin.

gotin

Ahmed Zekî
Okçuglû



Jibo ku dîrok carek din sîleyê xwe li me nede divê em hisyar bin

Piştî şerê Efganîstan û Iraqê di dinyayê de, bitaybetî jî di rojhelata navîn de pêvajoyek nû destpêkir. Digel vê projeyê di rojhelata navîn de jî niha ve guhartinên mezin çêdibin.

Di rojhelata navîn de sistema dagirkerî û zordariyê liser peymanana Lozanê hatiye avakirin.

Sistema Lozanê (ku statûkoya rojhelatanavîn liser wê sistemê hatiye avakirin) jî rûyê şerê Emrîka û Iraqê derbek mezin xwar. Tirsê dagirkerên Kurdistanê û zorkerên rojhelata navîn jî jixwe ev bû. Dagirker û zordar jî tîkçûna sistema Lozanê ditirsîn. Jibo pêşilêgirtina viya jî li dijî Emrîkayê hêzên xwe kirine yek. Di rojhelata navîn de iro li dijî Emrîkayê du şerên bi hev re girêdayî tê dayîn. Şerê yekê li Iraqê û Efganîstanê de Baasî û Îslamî didin. Ev şer vekirî û bi çek tê dayîn. Şerê didoyan jî, bi metodên diplomasiyê û di binî de tê meşandin. Wek tê zanin di şerê didoyan de navê Tirkîyê wek serkêşê hêzên kevneperest tê binavkirin.

Tu şik jê nîne ku Emrîka di Rojhelata navîn de jibo desthilatdariya xwe ya cihanî şer dike. Lê pir eşkere xuyaye ku dûmenek vî şerî ya siyasî jî heye. Emrîka jibo bicîhkirina desthilatdariya xwe dixwaze bi vî şerî di rojhelata navîn de, beta di cihana îslamî de sistema demokrasiyê û mafên mirovan bicîh bike. Bi gotîneke din bi rêya demokrasiyê û mafên mirovan nakokîya navbera çanda îslamî û rojavayê jî holê rabike. Kî çî dibêje bila bibêje ev jibo mirovahiyê şoreşek mezin e. Şoreşa demokrasiyê û mafên mirovan.

Wek bi bûyeran jî hat îspat kirin ku ev guhertin beriya her kesî me Kurdan pêwendar dike. Li başûrê Kurdistanê bîngeha dewleta Kurdistanê hate avêtin. Lê ev ne ewe ku Kurd jî dirokê piştrast bin û xwe bi devê herikîna bûyeran de berdin.

Em jî dirokê gelek baş dizanin ku di jiyana civakan de teorî û bûyer tim lihev nagirin. Bi taybet jî heke Kurd mijarê dirokê bin. Heta niha di rojhelata navîn de encama hemû guhertinên mezin li dijî Kurdan bû. Di sedsala 19an de rojavayî, dema ku bi navê „tan-zîmat“ reformên modernîzmê xwestin di împaratoriya Osmanî de bicîh bînin, Kurd li derveyî wê projeyê hiştin. Piştî Şerê I. yê Cihana dema ku împaratoriya Osmanî bi destê rojavayîyan ligor sistema netewewewlet hat tasfîyekirin, Kurd jî vî mafê hat bêpar hiştin. Rojavayî liser navê neteweyan mafê Kurdan yê netewî jî destê wan hat girtin. Welatê wan di nav welatên çêkirî de parve kirin.

Em gelek baş pê dizanin ku dijminên Kurdan, jibo ku ew carek din jî pêşdecûnên rojhelata navîn bêpar bimînin dest dane hev. Dixwazin pîrsgrêka Kurdan bi çarçoveya mafê mirovan bi sînor bikin. Heke di viya de bisernekevin, wê çaxê dixwazin pîrsgrêka Kurdistanê bi başûrê Kurdistanê bi sînor bikin. Û gelek dek û planên din...

Divê Kurd gelek hisyar bin û bi zebat û çalakiyên xwe pêşiya wan listikan bigirin. Jibo viya jî Kurd divê du tîştan bikin: Kêşeya Kurdan wek neteweyekî, bi gotîneke din wek kêşeya dewletê binin ser zimên; û jibo pêkanîna mafên xwe yê netewî yekîtiya xwe pêk bînin.

Kurd heta niha vekirî qala mafên xwe yên netewî nekirin. Ligel gelek sedeman, mercên dinyayê jî liber viya asteng bû. Edî divê mafên xwe vekirî û bitûnî binin holê.

Heke em bèn ser mijara yekîtiya Kurdan.. Kurd tim qala yekîtiya Kurdan dikin. Lê heta niha di vî mijarê de tu gawek serketî nehat avêtin. Du sedemên viya hene: Ya yekê serê Kurdan di vî mijarê de ne zelal e. Kurd nizanin ku heta niha jiber çî sedeman yekîtiya xwe ya netewî pêk neanîne. Ya didoyan, pîraniya kes an hêzên ku qala yekîtiya Kurdan dikin di rastiya xwe de viya naperêzin.

Jibo ku em karibin van herdu tîştan pêk bînin divê em dîroka xwe lê bikolin û kêmasî û xeletiyên xwe wek objektîf tespît bikin û bêjin.

Ev kirînen hanê li xweşiya gelek kesan û hêzên sexte neçe jî divê qe nebe rewşenbîrên Kurdan di viya de liberxwe bidin.



biravetî

Bayram Ayaz

PDK-Bakur: Çil sal Kurdayetî

Lê Tirmehê 1965 roja damezirandina Partiya Demokrata Kurdistanê Tirkîyê ye. Isal 40 saliya wê ye. Îro ev parti bi navê PDK-Bakur xebata xwe jibo azadiya Kurdistanê didomîne.

Di navê partiyê de sê gotinên cewherî hene: Partî, Demokrasi û Kurdistan. Civakên modern civakên demokrat û rêxistî ne. Di pêşveçûna demokrasiyê û civakên sivil de partiyên siyasî yên modern rêberên prosesa polîtîk û civakî ne û rola sazkeriyê bicîhtînin. Gotina sêyemîn Kurdistan navê welatê me ye. Yanî cih û warê Kurdan, axa ku Kurdiya şêrîn lê tê axaftin. Kurdistan wek ya me Kurdan e, helbet welatê xuşk û birayên me Kildanî, Ermen, Aşurî, Azerî binexihên Kurdistanê yên di ye jî. Gotina „Bakur“ jî navkirinek cografî ye. Di navkirina parçeyên Kurdistanê de bastire ku mirov peyvên cografî bikar bîne.

Dirûşma salvegera partiyê bi bawerîya min divê „PDK-Bakur: Çil sal Kurdayetî!“ be. PDKT bi hest û zanînek Kurdewarî hatiye damezirandin. Armanca wê ya sereke herîm Kurdayetî û azadiya Kurdistanê bûye. Di xebata xwe de gelo karibûye van armancên xwe cîbecîh bike, serkevtî bûye an na, ev pîrsek di ye. Eger mirov li mercên salên 1965an bikole, bûyerên ku liser hîmdarên partiyê bandora xwe hiştine binêre û diroka partiyê baş binirxîne, dikare bêje ku di diroka tevgera bakurê Kurdistanê de TKDP rûdanek siyasî-rêxistinî Kurdistanî ye.

Partî û rêxistinên siyasî yên ku di salên heftêyî de hatin damezirandin, tevgerên îdeolojîk bûn, lîgor doktrînek siyasî an meylek îdeolojîk şikil girtin. Jibo van grûpan îdeolojî û doktrîn ji bîr û hizrên welatperwerî girîngtir bû. Doza Kurd û Kurdistanê jibo xurtkirina îdeolojîya ku birêvebirên van partiyan pê bawer bû, zemînek bû. Eger mirov îdeolojî û Kurdewarî bidaya berhev, bê guman her yekê dê îdeolojîya xwe hilbijarta. Lê jibo TKDPyîyan doza Kurd û Kurdistanê berî îdeolojîyan dihat. Ew „milliyetçiyên“ me bûn.

Bist sih salên dawî tevgera bakurê Kurdistanê di bin bandora bîr û hizrên çep de bû. Digel ku newek berê be jî, lê hêj ev tesîr berdeyam e. Mixabin hinek hêj vî mejiyê çewt terk nakin. Îro cihê dilxweşiyê, ku bîrewerî û tevgera welatperweriya demokrat bîhêz dibe.

Partiyên demokrat berhemên serdemek taybetî ne. Zêdetirî van partiyan piştî şerê duyemîn ê cihanê hatine damezirandin. Sedemên xwe yên diroki hene. Di salên çilî de Nazi hatin ser hukm û Ewropa kirin meydana şer. Bi milyonan insan hatin kuştin, welat wêran bûn. Li serserê dinyayê pêlek faşîst bilind bû. Li dijî êrîşkariya faşîzmê hevberdiyêk navnetewî demokrat jî peyda bû û her çû xurt bû. Tevgera azadîxwaza Kurdistanê û rewşenbîrên Kurd jî li dijî faşîzmê di nav vî tevgerê de cihê xwe girtin. Roja Nû heftanemaya ku gorbuhêst Dr. Kamiran Ali Bedirxan li Beyrûde weşand, jibo helwesta rewşenbîrên Kurdan a li dijî faşîzmê delil û belgenameyek serbilindiyê ye.

Di damezirandina Partiyên Demokrata Kurdistanê de du faktorên girîng hene. Yek jê dirok û rehên Kurdayetiyê ye, ya di jî bîr û hizrên demokrat û mirovî yên li dijî faşîzmê û rejimên diktator e.

Partiya Rojhilat di 1945an de di bin serokatiya Pêşewa Qadî Mihemed de, ya Başur di 1946an de di rêberî û serokatiya nemir Mistefa Barzanî de, ya Rojava di rêberîya piranî kadroyên ji Xoybûnê wekî Dr. Nuredîn Zaza, Osman Sebri, Cigerxwîn de hatine damezirandin. PDKT jî bi tesîra bîrewerîya Barzanî û Şoreşa Îlonê, bi teşwîqa Katibê Şex Seîdê nemir Fehmiyê Bilalê Liceyî û bi alîkariya PDKên di ji terefê kesayetên welatperwer dilpak rêzdar Seîd Elçî, Emer Turhan, Şerafedîn Elçî, Derwêşê Sado û Şakir Epözdemir ve li bajarê Amedê hatiye damezirandin. Piştî demekê rewşenbîr û siyasethavên bi nav û deng Faik Bucak jî tev li vî komikê bûye û serokatiya partiyê hildaye ser milê xwe.

Çil saliya PDK-Bakur pîroz be û şehîd û dilsozên partiyê bi rêzdarî bibirtinim.

Kerkûk Kurdistan e !.. Emrîka û hevpeymanên wê jî îtiraf pê kiriye!

Silêmanê Alîxan

Pîştî daxuyaniya Serokwezîrê Îraqê el-Caferî ya di derbarey Kerkûkê de, ku têde daxwaz kiriye ku meseleya Kerkûkê bê lipaxistin jibo piştî nivîsina destûra bingehîn a dewleta Îraqa federal.

Serkirdayetiya siyasiya Kurdistanê jî, bi yek deng û di yek demê de, li Kurdistan û li Bexda jî bi gotin û bi kiryar, bersîva van daxuyaniyan dan û ji hemûyan re diyarkir ku jibo Kurdan meseleya Kerkûkê hêla sor e!

Li destpêkê birêz Kemal Kerkûkî serokê parlemena Kurdistanê bi wekalet, ji rojnamevanan re got; ev daxuyaniya el-Caferî jibo hemû xelkê Kurdistanê tiştêkî ne çaverêkirî bû û jibo me jî wek nûnerên xelkê Kurdistanê di parlemenê de, cihê dilgîrîyê ye.

Piştî bîrûyên siyasî yên herdu partiyan Kurdistanî (PDK) û (YNK), bi amadebûna herdu rêberên Kurd, Serokkomarê Îraqa Federal birêz Celal Talebanî û serokê Kurdistanê birêz Mesud Barzanî, li havîngeha Dokan civiyan. Piştî bidawîhatina civînan, Serokkomarê Îraqa Federal ragihand ku; “pêwîste benda 58 an jî yasaya demkî ya dewleta Îraqê zû bê bicîh anîn, dîsan got; “dema ez vegeyîyam Bexda ezê bi navê Serokatiya Kurdistanê û cenabê kek Mesud û xwe û hemû biraderên din, daxwaza zû bicîhkirina vî maddeyê bikim”.

Her di van civînan de biryara pêkanîna komîteyê hat dayîn, ew jî “komîteya dîwçûna destûra Îraqê û yekgirtina herdu îdareyan û reşnivîsa destûra herêma Kurdistanê”, ku ji çend endamên polîtîk bîroyên PDKê, YNKê û endamên komîteya yasayî a parlemena Kurdistanê pêk tê. Karê vî komîteyê dirustkirina hema-hengiyê ye di navbera endamên Kurd li Bexda û parlemena Kurdistanê de.

Vê komîteyê li roja Yekşemî civîna xwe ya yekem li parlemena Kurdistanê lidarxist, piştî komîteya yasayî li parlemenê teklîf kir ku reşnivîsa destûra herêma Kurdistanê amade bike.

Dîsan jibo parastina serwerî û taybetmendîya herêma Kurdistanê, parlemena Kurdistanê biryarek derxist û bi gorey vî yasayê parlemen dibe mercêiyetek siyasî û destûrî ji herêma Kurdistanê re û ji niha û pêş de, jibo wergirtina her biryarek peywendîdar bi çarenivîsa herêma Kurdistanê, divê endamên Kurd li parlemena Îraqê jibo parlemena Kurdistanê vegeyîrin.

Li Bexda jî endamên parlemena Îraqê daxwaza ektîvkirina karê “komîteya asayîkirina rewşa Kerkûkê” kirin û birêz Hemîd Mecîd Mosa endamê parlemenê û serokê vî komîteyê ya ku li serdema hikumeta Elawî hatiye avakirin, daxwaz kir ku budceyek ji bo komîteyê bê destnîşankirin û çend



bike. Dîsan îşaret da ku eger meseleya Kerkûkê neyê çarekirin, Kurd beşdariyê di dengdanê li ser destûra bingehîn de nakin.

Di heman dem de endamên Şîe di parlemena Îraqê de, jibo alozkirina meseleya Kerkûkê, diyarkirin ku ne tenê Kerkûk pêwîstî bi asayîkirinê ye, belkî gelek bajarên din yên jêriya Îraqê jî pêwîstiya wan bi asayîkirinê heye, loma divê çareyên dawiyê ji van meseleyan re jibo piştî danîna destûrê bimînin!

Dîsan her jibo têkdana karûbarên birêvebirina bajêr, hikumeta el-Caferî ta niha çî budceyê dirust ji civata parêzgeha Kerkûkê re destnîşan nekiriye. Herweha bi gorey nûçeyeka rojnameya “Basere”, kesaneke hemû lîst û tomarên helbijartinên 31/1/2005 li Kerkûkê pûçkirine, jibo ku çî belge li Kerkûkê jî Kurdan re nemînin!

Her li Kerkûkê li roja Duşembiya borî, bereyî Tirkmanî ku bi fermana generalên Tirk kar dike digel çend Erebeke Seddamî yên ku li Kerkûkê dijîn, jibo diyarkirina piştewaniya xwe ji el-Caferî re, x w e p î ş a n d a n e k saz kirin. Di vî xwepîşandanê de daxwazkirin ku Tirkman wek duwemîn netewe piştî Ereban li Kerkûkê bîn qebûl kirin û mafên wan di destûra dewleta Îraqê de bîn çespendin!

Li vir diyar dibe ku girift û asteng di rêya asayîkirina rewşa Kerkûkê de pirin, lê ev hemû girift û pîrgîrêkên ku Ereben şovînîzm û ajanên Tirkîyeyê dirust dikin, hewlên xîrşîn û çî pêve nayê û bawerîya me bi rewayiya Kurdistaniyeta Kerkûkê kêman nakin. Çonkî meseleya Kurdistaniyeta Kerkûkê bi dawî hatiye û ne tenê ji aliyê Kurdan ve hatiye qebûl kirin, belkî Emrîka û hevpeymanên wê jî dema Îraq azadkirin, jibo her bajarek “Parêzgehek” a Îraqê parêzgehekî Erebe danî, tenê ji Kerkûkê re parêzgehekî Kurd danî, ev jî îtirafeke eşkeraye bi Kurdistaniyeta Kerkûkê, loma em dibêjin ku meseleya vegeandina Kerkûkê tenê dem e, ew dem jî bi bawerîya me kêman û kurt e.

wezîrekên peywendîdar bibin endam di komîteyê de, herweha got; “vegerandina wan kesên ku ji Kerkûkê hatine derxistin jibo ser cihên wan meseleyêke yasayî û exlaqîye û divê bi zûtirîn dem kar jê re bê kirin”.

Ji aliyê xwe ve birêz Fuad Masum endamê parlemenê û serokê listeya hevpeymanîya Kurdistanê di parlemena Îraqê de, daxwaz ji desteya serokatiya parlemenê kir ku jibo ektîvkirina karê vî komîteyê, zextê bixin ser serokatiya civata wezîran, dîsan got eger serokatiya civata wezîran ev kar pê çênabe, ew dikare bi gorey yasaya demkî ya dewleta Îraqê daxwazê ji Sekreterê Giştî yê Neteweyên Yekbûyî bike da ku ew kesayetiyek diyar û bê layen jibo vî karî destnîşan

Ligel raya giştî ya Almanya wêneyê Kurdan û rola çapemeniyê

Di 30ê Hezîranê de NAVEND - jibo lêkolînên Kurdî li Almanya bajarê Kölnê bi navê, "Ligel raya giştî ya Almanya îmajê (wêne) Kurdan û rola çapemeniyê" semînerê yek rojî lidarxist.

Semîner bi axaftina serokê NAVENDê Metin Incesu destpêkir. Incesu piştî ku xêrhatina beşdar û axivkeran kir dest bi gotara xwe kir û got: "Mijara me di derbarê wêneya Kurdan di raya giştî ya Almanya û di vê mijarê de rol û berpirsiyariya çapemeniyê û rojnamevanan e. Wêneyê ku pêşkêşî raya giştî ya Almanya tê kirin çawaye? Ev wêne rastiyê nîşan dide? Di pêkhatina vê wêneyê de rola çapemeniya Alman çiyê? Di pêkhatina vê wêneyê de manipulasyona çapemeniyê heye? Di pêkhatina vê wêneyê de rola Kurdan çiyê?"

Berjewendiyên aborî di siyaseta çapemeniyê de rolekî serke dilîze. Û ev jî encam dide. Di pêkhatina îmajê Kurd de ev xwediyê payeke girîng e.

Mijara Kurd mijarek tevlihev e. Di vê mijarê de siyaseta Almanya ya hundir û derve bi hevdu re dimeşin. Pirsê Kurdî ya ku çapemenî dide naskirin bandorê him liser siyaseta derve ya Almanya û him jî liser entegrasyona Kurdan dike.

Wêneyê Kurd ligel raya giştî ya Almanya van salên dawî her guheriyê. Wêneyê ku liber çavên Almanan hatiye raxistin ne objektîf e. Yan di ser re hatiye çêkirin an jî hatiye dramatîzekirin.

Hin weşanên çapemeniya Alman di derbarê Kurdan de jî dayina nûçeyên objektîf bi taybetî direvin. Heta pirsê Kurdî tê marîjînekirin û tabûkirin û Kurd bi giştî wek Tirk bi Almanan didin naskirin. Ev rastî di her qedemeya civakê û dewletê de tê dîtin.

Piştê Metin Incesu dora axaftinê da axivkeran.

Wek axivker Prof. Dr. Rainer Geissler, Dr. Kemal Bozay, Prof. Dr. Christoph Butterwegge, Dr. Jochen Hippler, midûra radyoya Funkhaus Europa Jona Teichmann, Berpîrê yekem weşana radyoya Kurdî "Bernama Kurdî" li Almanya Jürgen Hoppe, Rojnamevan û nivîskar Dr. Günther Deschner û Hiqûqnas Celalettin Kartal beşdarî semînerê bûn.

Di rûniştina (civîn) yekem de ku rêvebirîya wê Ömer Tuku dikir, Prof. Dr. Rainer Geissler di derbarê "Kêmaniyên etnikî û Çapemenî" nêrînên xwe pêşkêş

Serokê NAVEND'ê Metin Incesu got "Mijara me di derbarê wêneya Kurdan di raya giştî ya Almanya û di vê mijarê de rol û berpirsiyariya çapemeniyê û rojnamevanan e. Wêneyê ku pêşkêşî raya giştî ya Almanya tê kirin çawaye? Ev wêne rastiyê nîşan dide? Di pêkhatina vê wêneyê de rola çapemeniya Alman çiyê? Di pêkhatina vê wêneyê de manipulasyona çapemeniyê heye? Di pêkhatina vê wêneyê de rola Kurdan çiyê?"



kir. Geissler Qanada wek nimûne nîşan da û got ku çapemeniya Alman di vê mijarê de îmtihanek baş nedaye. Liqor Geissler, Qanada xwe wek welatekî koçberan û pirkultûrî binavdike û di warê bikaranîna hemû mafên civakî û çandî yê kêmaniyên etnikî de nimûneyek baş e.

Mijara axaftina Dr. Kemal Bozay "Di navbera bendbendî û marîjînalîbûnê de Kurd" bû. Bozay ragihand ku çapemeniya Alman, Kurdan wek qurban yan jî kesên ku otobanê dagir dikin, krîmînal grûbek ku zêde polîtîze bûye û çalakîyên şidetê lidardixin, binaskirin dide. Ji portreyê ku Kurdan zêde polîtîze xuya dike û Kurd bi pîrsên polîtîk tîr rojevê bêtir Bozay rexne kir ku Kurd tenê bi çalakîyên şidetê tîr rojevê û daxwazên polîtîk yê Kurdan bi awayekî pêdivî di çapemeniyê de cih nagire.

Di civîna duyem de rojnamevan behsa tecrubeyên xwe yê pratîk kirin û nêrînên xwe yê di derbarê jîholêrakirina berdazî (pêşdarazî) û lidarxistina diyalogê rola çapemeniyê pêşkêşî beşdervanan kirin. Jibo tedbîrên bîstendî û kiryarên ku divê bîstendî kirin pêşniyariyên xwe bi guhdarvanan re parvekirin.

Dr. Jochen Hippler di axaftina xwe de mijara kêmaniyên etnikî, entegrasyon û di derbarê kêmaniyên de nêrînên civaka Alman û medya anî zimên.

Prof. Dr. Christoph Butterwegge jî beşdervana re behsa xebatên xwe yê di derbarê rassîzm û antî semîtîzmê kir. Butterwegge got: "Mijarên cudayetiya etnikî û pevçûnên medeniyetan di çapemeniyê de pîr cîh digrin. Bi taybetî jî medya rastgir van mijaran her di rojê xwe de digrin û rê liber

pevçûnan vedikin. Divê rojnamevan di van mijaran de bîstendî perwerdekirin."

Di vê beşê de rojnamevan, weşanger û nivîskar Dr. Günther Deschner bi tevgera Kurd û hevnasîna xwe ya bi Mistefa Barzanî re dest bi axaftina xwe kir û bi berdewamî got: "Cara yekem di sala 1973an de wek peyamnêrê rojnameya Die Welt çûm Başûrê Kurdistanê û min bi Mistefa Barzanî re hevpeyvîn çêkir. Di navbera salên 1973-1975an de ez 9 meha li wir mam. Ji wê demê û vir de ez bi tevgera Kurd re di nav pêwendîyan deme. Dostaniya min a bi Mistefa Barzanî re destpêkir, piştê bi Mesûd Barzanî

"Mijarên cudayetiya etnikî û pevçûnên medeniyetan di çapemeniyê de pîr cîh digrin. Bi taybetî jî medya rastgir van mijaran her di rojê xwe de digrin û rê liber pevçûnan vedikin. Divê rojnamevan di van mijaran de bîstendî perwerdekirin."

re dom kir. Cara dawî di serê sala 2005an de ez çûm Kurdistanê başûr. Mixabin medya di derbarê Kurdan de tenê cîh dide nûçeyên sansasyonel. Di medyayê de cîstendina mijaran bêtirîn car bi berjewendiyên siyasî ve girêdayî ye. Di sala 1973an de çûyina min ya Kurdistanê Iraqê bi siyasî bi meyla xwediyê rojnameyê ve girêdayî bû. Xwediyê rojnameyê bi dewleta Îsraîlê re xwedî pêwendiyên dostane bû. Iraqek xurt ne jî berjewendiyên Îsraîlê bû. Jiber vê yekê dixwest ku dengê Kurdan ku li dijî Iraqê şer dikin ragihîne raya giştî ya dinyê. Siyasetek wek vîya di wê demê de em dikarin di derbarê Kurdan li Tirkîyê de di rojnameya Frankfurter Rundschau de bibînin. Di salên 1992-1993an de wexta Kurdan li Almanya çalakîyên şidetê dikirin ez çûm Şamê û min bi A.Öcalan re hevpeyvîn kir. Wê demê rêxistina îstixbaratê jî bi Öcalan re dipeyvî. Mesela hin bûyerên ku bi guhdarkirina telefonan plankirina wan hat famkirin, axaftinên telefonê bi Öcalan re hatin asteng kirin."

Axivkeran eşkerekirin û di vê fikrê de gihan hevdu ku, "Kurd ne tenê alîgirên PKKê yê ku çalakîyên şidetê dikin û ew kesên ku li kolanan eronê difroşin e; Kurd jî wek hemû gelên mayî

karker, dixtor, mihendîs û esnaf in û li vî welatî baca xwe didin û berpirsiyariyên xwe yê li himber dewletê pêk tînin.

Hema hema hemû axivker di baweriyê debûn ku Kurd di çapemeniya Alman de ne xwedî îmajek başin û pîrsê Kurdî di çapemeniya Alman de qasî ku divê cîh nagire. Wek sedem jî nîşan dan ku her çiqas çalakîyên PKKê di vîya de xwedî rolek be jî, esas sedem berjewendiyên polîtîk in.

Dr. Deschner û Jürgen Hoppe wexta bersîvên guhdaran dan eşkerekirin ku Almanya dixwaze di Konseya Ewlekariya Rêxistina Netewên Yekbûyî de cîh bistîne û jiber vê yekê pêwistiya bi piştgiriya Tirkîyê, Îranê û 21 dewletên Ereban dibîne û jiber ku di pêşerojê de bi rejîma Iraqê re di nav pêwendiyên ticarî debû naxwaze Kurdistanê başûr liber çavan bigire.



Mandelayê Kurd Xenî Bilûryan:

“Xanima min Merze digot: ‘Ez amademe cenazeyê te wergirim, lê naxwazim bibînim ku tu liser ekranên televizyonan bibêjî ku ez poşman bûme”

Gelek kes ligel kerwanê xebatê birêdikevin, lê kêm kes ji wan heîta dawî diçin. Eger Başûrê Afrika serê xwe bi Nelson Mandela û hevalên wî bilind dike, Kurdistan ji serê xwe bi Xenî Bilûryan, Ezîz Yûsivî û Sedîq Xatemî bilind dike. Xenî Bilûryan zêdetirî 25 salan, Ezîz Yûsivî 25 salan û Sedîq Xatemî ji 16 salan di zîndanê de man.


Dibêjin li pişt her zilamekî mezin, jinek mezin heye, xanima Xenî Bilûryan ji yek ji wan jinên berxwedare ku bi salên dûr û dirêj li hêviya azadbûna hevserê xwe maye. Wê tim her piştgiriya wî kiriye ku ew bikaribe liser xwe bimîne.

Peyama Kurd: Karwanê ve xebata dûr û dirêj çawa destpêkir?

Xenî Bilûryan: Ew dem serdema Riza Şah bû. Ingilîzan ew kirin Şah. Dema ku Hîttler li Ewropa bihêz bû, Şah riya xwe guhert û berê xwe da Hîttler. Peywendiya Şah ligel Hîttler bû sedema nerazîbûna Ingilîz, Emerîka û Rûsya. Jiber vê yekê Îran bû bingehêk bihêz jibo Almanan û casûsên Alman ji di navbera eşîretên Îranî de li Xoziztan û hinek deverên din, kar dikirin ku liser sînorê Azerbaycanê eniyekê li diji Sovyetê vekin.

Du armancên hatina hêzên Amerîka û Rûs jibo Îranê hebûn. Yek, têkbirina tevna ku Hîttler li Îranê rêsa bû. Dido, wan dixwestin bi riya Kendavê çek û sîlehan bişînin Sovyetê jibo ku ew bikaribe xwe li beramberî Almanan bigre. Di wê serdemê de Sovyetê doza çekan li hêzên hevpeyman dikir û digot ku ew di aliyê çekan de lawaz e. Lê belê Sovyet di aliyê çekan de nelawaz bû. Lê belê wê hesab dikir ku hêzên hevpeyman piştî têkbirina Almanan berê xwe bidin wê. Jiber vê yekê çekên xwe vedîştin û bi çekên Amerîka şer dikirin.

Piştî hatina hêzên hevpeyman Şah ji text hat xistin. Hêzên Sovyetê hatin nava Azerbaycana Rojavayê Îran û Mehabadê. Di wê demê de xelkê Mehabadê jiber tirs qetlîamê ji bajêr reviyên. Jiber ku wan di Şerê Yekem yê Cihanê de piştevaniya Osmanîyan kiribûn û bûbûn hedefê qetlîama Rûsan, ew di tirsîyan ku ew carek din bînin qetilkirin. Ez ji yek ji wan kesan bûm ku min wê demê bi destê birayê xwe girt û ji bajêr derketim. Dema ku Rûsan tirsaxelkê



dîtin, efserek hat jibo xelkê axivî û got “em dostê we ne, em jibo azadiya we hatine, cilên xwe lixwe kin û çekên xwe hilgirin, netirsîn!”. Hêdî hêdî xelk vegeriyan Mehabadê û Rûsan bingehên leşkerî yê Îranê bêçekirin. Hemû dam û dezgehên dewletê ji Mehabadê derketin. Bi tenê daîreya polîsan jibo demekê kin ma. Fermandarê wê daîre Serheng Qulabî bû û ew xelkê Kirmaşan bû. Lê belê xelkê çek ji wan ji wergirtin û ew derbeder kirin. Li Kurdistanê û bi taybetî li Mehabadê azadiyek bêsînor çebû.

Berî van bûyeran, di navbera rewşenbîrên Mehabadê de civîn dihatin çêkirin. Lê belê ew veşartî bûn. Di bin navê lîsk û kombûna cîranan de xebata Kurdayetiyê dihat kirin. Bingeha ramanî ya KJK (Komela Vejdîna Kurd) di wê demê de hat avêtin. Endamên KJK hatin li mala Hecî Dawîd civînek çêkirin û Komele damezirandin. Kovara “Dayka Niştîman” organa KJK bû. Helbestvanên Kurd yê weke Hejar û Hêmin helbestên xwe têde belav dikirin, me ew dixwendin û em ji wan fêrî Kurdayetiyê dibûn. Bândora wê liser me hebû. Rojêkê komek ji leşkerên Sovyetî hatin Mehabadê. Yek ji wan Kurdê Sovyet bû û navê wî Caferov bû. Ew efsere ku ligel Caferov hatibûn, xwestin ligel me yariya Voleybal bikin. Caferov hejmarek mezin ji rojnameya “Riya Teze” ya ku li Ermenistanê di-

hat çapkirin ji me re anibû. Me ji hêdî hêdî hewl dida ku fêrî fontên Rûsî bibin û bixwînin. Di wan rojnameyan de behsa Konsomolan (rêxistinên Xortên Sovyetî) bala min kişand. Zilamek di nava mala bavê min de hebû. Navê wî Emînê Ehmedê Zeyneb bû, Kurdekî pir baş bû. Kirin û firotin û qaçaxî dikir. Gelek kes nasdikirin, û ji wan fêrî pir tiştan bûbû. Wî Şêx Qadîr û Şêx Ehmed nasdikir, Şêx Mehmûd nasdikir, behsa tevan jibo min dikir û bandora gotinên wî li min dibû. Di serdema Şah û berî wê de ji, di derbarê Kurdayetiyê de tiştêk tunebû. Piştî min biryar da ku ligel komek biraderan rêxistinekê bi navê “Sazûmana Ciwanên Kurd” damezirînim. Heta dema damezirandina vê rêxistinê, ez ne endamê KJK bûm. Sazûmana Ciwanan serbixwe bû, pêwendiya me bi KJK tunebû û me endamên wan ji nasnedikirin. Di komeleya KJK de bi tenê yek kes dihat nasîn, ew ji Ebdulrehmanê Zebîhî bû. Wî kovar belav dikirin, diçû û dihat û çalakî birêdixistin. Me bi tenê kovara wan dixwend. Komela KJK di wê demê de çalak bû. Kovara “Dayka Niştîman” dibîrin li Tebrîzê çap dikirin û carek din tanîn li Mehabadê belav dikirin. Di sala 1320an de, ku dibe 1941ê Mîladî me sazûmana xwe damezirand. Me carcaran civîn çêdikirin, sirûdên ku li Kurdistanê Iraqê hebûn me guhdarî dikirin û vedixwendin. Piştî wê demê komeleya KJK xwe eşkere

kir. Qazî Mihemed heta wê demê ne di nava komeleya KJK debû. Wê demê komelê Qazî Mihemed vexwend civînekê û ji wî xwestin ku bibe rêberê komeleya KJK. Wî ji qebûl kir û komeleya KJK bi awayekî fermî hat ragihandin.

We di Sazûmana Ciwanan de fikra komunistî hilgirtibû yan armanca we bi tenê Kurdayetî bû?

Wê demê jixwe me komunist nasnedikirin. Me bi tenê hest bi Kurdayetiyê dikir. Qazî Mihemed ji me xwest ku em şanoyekê çêbikin. Wê demê şanoyek ji Iraqê hatibû. Heta niha ji ez nizanim kê ew ji Iraqê anibû. Rehmetî Mistefa Xoşnaw û Mîrhac Ehmed di nava biroya KJK de li odeyek taybetî diman. Pêwendiya min ligel wan hebû û min sîd ji nerînen wan wergirtin. Mistefa Xoşnaw dihat dibistanê û dersên Kurdî dida me. Li wir min hinekî fikra sosyalistî wergirt ku bi piranî Mîrhac Ehmed behsa wê dikir. Mistefa Xoşnaw ne ligel wê fikrê bû. Ew bi temamî Kurd bû. Mîrhac jibo me diaxivî û pêwendiyên wî ligel rewşenbîrên Sovyetî ji hebûn. Qazî Mihemed ji min xwest ku ez li biroya pêwendiyên partiyê, ligel Dilşad û Zebîhî kar bikim, ew şanoya ku Qazî Mihemed dixwest em pêşkêş bikin, ligor dîtina min ji aliyê Mistefa Xoşnaw û Mîrhac Ehmed ve hatibû amade kirin. Ligor şanoyê Kurdistanê azad dibû û paşayek

dihat ser hikum. Lê belê Caferov hat, nerazîbûna xwe nişan da û got “ne lazime melîkî be, bela komarî be”. Qazî Mihemed ji got “rast e, şano wekê xwe dimîne, lê li şûna melîk, serok-komar deynin”. Prove xelas bû û şano hat pêşkêşkirin. Şano bi navê “Dayka Niştîman” bû. Pêşewaziyek mezin li şanoyê hat kirin. Li derdora Mehabadê kes nema ku nehat temaşeya “Dayka Niştîman”. Jin, zarok, endamên eşîran û herkes. Qazî Mihemed got, herin li Nexede û Şîno ji pêşkêş bikin. Li Nexede me şanoya xwe bi heman germayê pêşkêş kir. Piştî em çûn Şîno. Wê demê jibo tîpa şano cilûbergên taybetî jibo me hatibûn amade kirin, êleg û kumên spî wek yê hêzên deriyayî bûn. Xelkê Şîno pir oldar bû. Dema em diçûn nav bajêr xelkê bi xerîbî li me temaşê dikir. Yek bi me re bû navê wî Ebdulhê Nehrî bû. Dengê wî pir xweş bû û Quran tev jiber kiribû. Ebdulhê Nehrî şêx û mele û endamên eşîran tev jibo şanoyê vexwendin. Wê êvarê wî bi dengê xweyê xweş ji wan re Quran xwend. Roja din em çûn mizgeftê jibo bikaribin pêwendiyên ligel xelkê deynin û nimêj bikin. Jiber ku Qazî Mihemed şîret li me kiribû ku em bi exlaq û rabûn û rûniştina xwe wî xelkê oldar bikin dostê xwe. Piştî xwendina Quranê, baweriya xelkê li hemberî me hat guhertin. Li bazarê rêza me digirtin, çay ji me re dianîn. Hêdî hêdî me wisa kir ku bikaribin temamê xelkê jibo temaşekirina şanoyê binin. Herkes hat lê jin nehatin. Wê demê ramanên min hêdî hêdî di serê min de meyan û çî girtin. Dema em vegeriyan Mehabadê, Qazî Mihemed gelekî spasiya me kir. Ji Şîno şandek hatibûn cem Qazî û xwestibûn ku ew şaxekî partiyê li wir vekin. Bi vî rengî şanoya “Dayka Niştîman” bandor li wan kiribû. Piştî wê demê KJK em vexwendin biroya Partiyê ku Dilşad, Zebîhî û Heyderî li wir rûniştî bûn. Van hersê kesan nûneriya KJK dikirin. Wan ji me pîrsa armancên me dikirin û me ji bersiva wan dida. Piştî wê demê gotin “em herdû alî ji yek in, armanca me Kurdayetiyê, em dixwazin ku Sazûmana Ciwanan ji tevî me bibe”. Em razî bûn û rêxistina me bû Sazûmana Ciwanên KJK. Ez ji berpirsyarê Sazûmanê bûm. Berî ku hikûmet û dewlet were çêkirin, jibo temamkirina xwendina bilind min xwest ku

biçim Tehranê. Lê belê bavê min qebûl nedikir. Ez neçar mam ku biçim cem Qazî Mihemed û ji wî re bibêjim ku bavê min nahêle ez biçim Tehranê xwendina xwe tamam bikim. Qazî, gazî bavê min kir û jê re got "ez wî dişinim Tehranê, bela xwendina xwe tamam bike, piştê ezê fikrekê jibo wî bikim". Piştî demekê me bihist ku li Tewrêzê şoreş çêbûye û Cafer Pêşwerî û Firqeya Demokratiya Azarbaycanê serkêşiya wê kirine. Liser daxwaza Qazî Mihemed ez çûm Mehabad. Lê di wê demê de Azeriyan nedihîştin ku kesekî Faris di nav wan re derbas bibe. Min got "Ez Kurd im" û rê dane min. Ez rojekê li Tewrêz mam û piştê çûm Mehabade. Di wê demê de li Tewrêzê xaniyek çêkiribûn û hejmerek ji zarokên Mehabadê li wir bicîh kiribûn û li dibistanek Sovyetî bi zimanê Azerbaycanî didan xwendin. Di nava wan zarokan de Elî Qazî, Silêmanê Muînî û çend kesên din jî hebûn. Qazî Mihemed ji min re got "biçe Tewrêzê, li wê mala xwendevan bimîne û piştê here dibistana navendî ya Cefexendan" (Cefexendan şafreki navdar ye Azerbaycana Sovyetî bû û li wir ders dida). Ez jî jibo demekê li wir mam û min her li wir bihist ku behsa çêbûna Komara Kurdistan ya Mehabadê dibe. Ez vegeyiam Mehabadê. Pêşewa Qazî Mihemed li meydana Çarçira Îlana Komarê kir. Ew bi kincên serbazîbû, lê şaşika wî li serê wî bû. Wê demê Serok Barzanî li pêşiya wî rawestiyabû. Xwendevanên dibistanan bi ala Kurdistanê dihatin û di ber Qazî re derbas dibûn. Xelkê Mehabadê qefle bi qefle dihatin û derbas dibûn. Karmendê Sovyetî jî ev bûyer qeyd dikirin.

Piştî ragihandina Komarê kar û erkê cenabê te çibû?

Ez her endamê KJK û serokê sazûmana Ciwanên Kurdistanê bûm. Jiber ku jibo temamkirina xwendinê lazimbû ku ez biçim Tehranê, berpirsariyên min ji aliyê Qazî Mihemed ve jibo yekî din hatibûn dayîn. Piştê ez çûm Tewrêzê û piştî demekê Kurt 50 kesên din ji Mehabad anîn gel min. Em birin bingehê leşkerên Sovyetî, tendûristiya me saxtî kirin û ji me pirs kirin ka em dixwazin çî bixwînin. Min xwest ez firokevaniyê bixwînim. Ji 11 heta 12 kesên Azerbaycanî jî xwestin vî beşî bixwînin. Em Kurd 50 kes bûn, lê Azerbaycanî 300 kes hatibûn. Ji min re gotin li Azerbaycana Sovyetê diyar dibe ka tu dikarî vî beşî bixwîni yan na? Bi trêne Em birin Bakûya paytexta Azerbaycanê. Em birin dibistanek serbazî û li wir bi cîh kirin. Ji min re gotin ku ferman nehatiye ku em Kurdan bişinin Gence jibo fêrbûna firokevaniyê û pêwîste hûn li vir bixwînin. Dewreyek kurt ji me re vekirin.

Ez di beşê hawinan de bûm. Bi şev û bi roj me perwerdeya serbazî didit. Me dewreya xwe tamam kir, cilên taybetî wergirt. Şevêkê me guhdariya beşê Farisî yê radyoya Hindistanê dikir, radyo bi vî rengî behsa Îranê kir ku dewleta Îran bi navê hilibjartinê çûye Azerbaycan û got ku Qazî Mihemed jî hatiye binçavkirin. Her wisa behsa Serok Mistefa Barzanî kir û got ku ew ligel hejmarek pêşmerge li devera Sofyan û Sêl û derdora Nexedê şer dike. Em gelekî xemgîn bûn.

Radyo bi dirêjî behsa rûxana Komarê kir?

Em gelek aciz bûn û neçûn cihê xwendinê. Efserekî Rûs bi navê Elîyev hebû ku bixwe partizanekî mezin bû û li derwaza Moskow li dijî Almanan şer kiribû. Elîyev mamosteyê topxanê bû, ji me re got çima hûn nayên dersê? Me got rewş bi vî rengî ye û em dixwazin vegeyiam Îranê. Elîyev got "Ez nesihetê li we dikim ku hûn çekan ji Sovyetê bixwazin û ez dikarim we bibim bigihînin Mele Mistefa Barzanî li çiya jibo alikariyê. Me spasiya dibistana serbazîyê kir û me got, "miletê me di şer deye, me bigihînin wan". Wan got em nikarin biryara wê yekê bidin, divê hûn jibo Stalîn binivîsin. Hûn çî binivîsin emê bişinin. Her yekî ji me tiştê nivîsî. Min jî wiha nivîsand "zorspasiya we dikim ku we alikariya me kir û em fêr kirin, ez dixwazim biçim Kurdistanê û alikariya miletê xwe bikim, eger hûn min neşinin jî ez naxwazim êdî li vî dibistana leşkerî bimînim, min bişinin dibistana Rojhelat (ew dibistana siyasî bû li Azerbaycan). Bersiv hat û daxwazên me nehatin qebûl kirin û em teslîmî Îranê kirin. Beşek ji me bûbûn efsêr û dikaribûn li Sovyetê bimînin. Bi vî rengî em bi trêne birin ser sinor û teslîmî Îranê kirin. Berpirsarekî Îranî hat, ji me re wiha got "Tu gunehê we di van rûdanan de tune ye, lê van kesên ku ev tişt xistine serê we, lazime hûn ji serê xwe bavêjin û li malên xwe vegeyiam. Herkes vegeyiam bajarê xwe û ez jî vegeyiam Mehabadê.

Di wê demê de nerîna we liser Barzanî çibû?

Min du caran ew dit. Cara yekemîn hîna dema ku ez berpirsarekî sazûmana Ciwanan bûm serok Barzanî ligel komek pêşmerge hatibûn li kêleka çemekî bi cîh bûbûn û li hêviya dîtina Qazî Mihemed bûn. Min berî wê demê jî navê Barzaniyan û şoreşa wan bihistibû. Em çûn cem wan û me pirs kir "Hûn Barzanî ne? Gotin, "belê." Şaşikê tevan sor bûn. Min jî yekî pirs kir "Mele Mistefa kî ye? Wî got ez im. Ligor nerîna min, min digot cil û bergên Mele Mistefa ji yê pêşmergeyên din cudatir in. Di

wê demê de Qazî Mihemed Hecî Dawidî şand ji bo xizmeta Mele Mistefa. Mele Mistefa ji cihê xwe rabû. Wê demê min bawer kir ku ew bi rastî Mele Mistefa ye. Çi cudabûna wî ji pêşmergeyan tune bû ew liser erdê rûniştibû û tivingek Brûno di destê wî debû. Ew cara yekê bû ku min ew dit. Cara diwem em li dibistana navendî bûn, xeber dan me û gotin, "Sibe Mele Mistefa tê, cilûbergên ciwan lixwe kin û zû werin". Mamosteyê me got derkevin û li ber derî rawestin, Em derketin, me ew dit. Ne kesek ne çekdarek û ne jî parêzvanek ligel wî bû. Wek herkesê sade, rastûrast hat. Me jibo rêzgiritna wî destê xwe bir ser sînga xwe. Wî destê me tevan guvaşt û piştê em derbasî salonê bûn. Wî li wir jibo me axaftinek kir. Gotinên wî bandorek mezin li min kir jibo ku ez liser rîya xwe berdewam bim. Barzanî got "Kurno! Bixwînin, mezin bibin lê xizmeta netewa xwe bikin. Nete wa we muhtacî we ye. Jibo bêrika xwe kar nekin, xizmeta miletê xwe bikin". Piştê Mihemed Qudsî tiştê jibo me xwend ku behsa Barzan û şoreşên Barzan dikir. Gotinên Barzanî bandorek mezin li min kirin.

Bi dîtina we eger Qaziyê nemir ligel Barzanî derketa serê çiyân, wê daxwaz û heyecana gel ya jibo tekoşinê zindîtir nemaya?

Qazî Mihemed bihistibû ku artêşa Îranî li Azerbaycanê 20 hezar nefer qeniqandibûn. Qazî Mihemed şerm dikir ku weke Pêşwerî bireve. Pêşwerî jî gotibû Qazî Mihemed ligel me were, lê ew neçûbû. Piştê Barzanî daxwaz kiribû ku Qazî ligel wî biçê, lê wî bi tenê Ala Kurdistan teslîmî wî kiribû û gotibû lazime ew ligel te be. Mele Mistefa ji Qazî re gotibû "Eger tu ligel min bê, ezê liser çiyân jî vî alê her hildim, tu Serokkomarê Kurdistanê yî û dinya te nasdike". Eger em di aliyê siyasî de şirove bikin, çûna Qazî Mihemed ligel Mele Mistefa xwediyê giringiyek mezin bû. Eger wî ev yek kiribûya, ligor baweriya min wê biryarek di cîhde bûya.

Piştî hatina ji Sovyet û ketina nava xebatê, tu cara yekemîn kengî hatî binçavkirin?

Piştî ku ez vegeyiam Mehabadê, min ligel komek heval civinek çêkir, di wê civînê de "Dr. Qadirî Mehmûdzade, Mihemedê Şahpesindî, Ezîzê Ferhadî û Sedîqê Xatemî" amade bûn. Me biryar wergirt ku em xebatê bidomînin. Civîn li mala me çêbû. Pêwîstbû em belavokekê belav bikin jibo ku xelk bizanibin ku xebat berdewame. Wê demê pereyên me tunebûn. Pêwîstbû em biçin belavokê li çapxaneyên Tewrêzê çap bikin. Me nikaribû em wê yekê jî bikin. Di wê demê de partiya TUDEH partiyek fermî bû. Me jî got, çima em ji wan

nexwazin ku alikariya me bikin, ma ne ew herdemê dibêjin ku "em aligirên hejar û feqîran in".

Me Qadirê Mehmûdzade şand ku ew belavokê bibe li Tehranê çap bike. Partiya TUDEH ji wî re gotibûn "We partiya xwe hîna nû avakiriye, eger hûn ji niha ve xwe eşkere bikin, wê we tevan bigrin û kes namîne ku xebatê bike. Bela partiya we mezin bibe, piştê xwe eşkere bikin. Ev yek jibo we baştîrê". Lê em ciwan bûn, jibo me derxistina belavokê giring bû. Jiber vî yekê me guh neda nesiheta wan. Partiya TUDEH belavoka me çap nekirin. Piştê ji min xwestin ku ez biçim Başûrê Kurdistanê çap bikim.

Dema ku cenabê te vegeyiam Îranê, Mele Mistefa li Kurdistanê bû yan derketibû Sovyetê?

Barzanî derbasî Sovyet bûbû. Eger me bizaniya Barzanî tê Sovyetê, em nedihatî Îranê. Lê mixabin desthilatdarên Sovyetê hertişt ji me veşartin. Ji me re cihê Mele Mistefa nedigotin. Carekê ji min re gotin, ew li devera Sofyanê şer dike. Eger Barzanî li Kurdistanê bimana emê jî ligel wan pêşmerge bûna. Jibo çapkirina wê belavokê pêwîstbû ez biçim Îraqê. Min ji hevalên xwe re got, "Ez baş dibînim ku Mihemedê Şahpesind ligel min bê, jiber ku Kurdiya wî başe û di karûbarê çapxanan de jî şarezayê". Hevalên min gotin, "Tu çawa dikî tu zanî. Piştê em çûn Silêmaniyê mala Şêx Letîfê kurê Şêx Mehmûd. Heşenê Qizilcî, Rehmanê Zebîhî û Seyid Mihemedê Samedî jî li wir bûn. Em ligel Zebîhî axivîn û em bihevê çûn serdana serokê wê demê yê PDK Hemze Ebdula. Çapxane li cihêkî veşartî hatibû danîn. Wan li çapxaneyê font amade dikirin, di nava selîkê de vedîştartin û dibirin li cihêkî din çap dikirin. Me ji wan xwest ku belavoka me çap bikin. Pêwendiyên Zebîhî ligel Şêx Letîf baş bûn. Wî bi roj ligel Hemze Ebdula kar dikir û bi şev vedigeriya mala Şêx Letîf. Dema ku em çûbûn wir, xeber gîhabû hikûmeta Îraqê ku em hatinê. Di wê demê de Omer Elîyê Tirkman waliyê Silêmaniyê bû. Omer Elî xeber şand ji Şêx Letîf re û got, "Eger tu wan Îraniyan ji mala xwe dernexîni, emê bîni û wan bi zorê bigrin". Şêx Letîf parêzvanekî xwe şand ser mala Omer Elî bombeyek avêt mala wî. Piştî vî bûyerê walî bédeng bû. Em jî bi erebeyê birin gundê Sîtek. Du malên Şêx Letîf heb Xanimêk wî navê wê Helabû û li Silêmaniyê dimandin ji keça Selîmxanê navê wê Telaxan bû. Min re got "daxwaza ji partiyê nekin". Xuyaye demê nakokiyên Şêx ligel Pa û Komunîstên Îraqê hebûn. Wî got ku ew jibo me çapxanê çê-

dike. Zebîhî û Hemê Şahpesind nexsaya çapxanê çêkirin û Şêx Letîf bixwe çû li Silêmaniyê liser dikanên hesinkeran geriya û parçe bi parçe amade kir û anî. Piştê ew çû Bexdayê, tîp û hibîr û kaxez jî anîn. Xema me jî her çapkirina belavokê bû. Şêx Letîf ji me xwest ku em tiştêkî li dijî Partî û Komunîstan binivîsinin û çap bikin. Bersiva me jî ew bû ku em nehatine li dijî kesî kar bikin, em jî Kurd in û ew jî, em jibo Kurdayetiyê hatine. Me ew yek nekir û Şêx Letîf jî daxwaza xwe bi paş ve kişand. Me di encam de belavoka xwe çap kir. Ez çûm cem Hemze Ebdula û min got, "jiber ku ez rê nasnakim, ez hez dikim ku tu min bişini Îranê". Min belavok û tiştên xwe anîn û li nêzîkî Bokan em çûn gundekî bi navê Girdî Gilan. Li wir em çûn mala Seyid Kamîlê Şair. Kovara Rêga ligel me bû. Gotara yekemîn ji aliyê Seid Qizilcî ve hatibû nivîsandin bi sernivîsa "Li Gorî Fikra Lenîn Kêşeya Milî". Min jî gotarek bi sernivîsa Artêşa Sovyet yan Xelîyên Diktatoriyê nivîsandibû. Min jî Seyid Kamîl re got, "Van tiştên ligel min ji min re veşere. Wan kurtanê kerekî anîn, nava wî vala kirin û belavokên min tê de bi cî kirin. Min got, "Hûnê van tiştan bidin Hemed Emîn ewê ji min re bîne.

Hûn bi delîl hatin girtin, yan bi gumanan?

Tenê bi guman. Ew demek bû ku ez ne li Mehabadê bûm û vî yekê bala wan kişandibû. Ji wan kesên ku destê wan di çapkirina belavokê de hebûn, bi tenê ez hatim girtin. Du kesên din jî girtin, Sedîq Xatemî û Ezîz Yûsivî. Her wiha 70-80 kes ji endamên kevin yên PDK-Îran jî liser gumanan hatibûn girtin. Em birin cem rêvebiriya polisan, lê wê demê êşkence ne bi vî rengî bû. Wan tenê bi şeqam, lédan û çewisandinê êşkence dikirin. Em derketin dadgehê û hukmê 3 sal hepis dane me. Em li dij derketin û me serî li dadgeha diwemîn da. Mirovekî mezin li Mehabadê hebû navê wî Şafî bû. Şafî her serheng Emîr Dîwanî (mekemê) bû. Her wî mamê min jî bû. Şafî re gotibû ku jibo ku min az çûm dadgehê û serokê Emîr girtin.

dik
beş
bi zeh
ku biza
radyo
Şuriyê çû
ji ewbû ku
Georg Bush
Partiya Baas

Esad li riya revê digere!

Bîrîl ji amadevanan re got: "hûnê dîrokê di vê hotêlê de çêbikin"



PK - Rojnameya "el-şerq el-ewset" a Erebî, di hijmara xwe ya roja 6/7/2005an de, nûçeyek weşandiyê û tede dibêje ku serkirdeyên opozisyona Sûri li "Dewletên Yekbûyî yên Emrîkî" di rojên 18 û 19 ê meha bûrî de, civînên nehênî lidarxistin û di encamê de civatek niştimaniya Sûri pêkanîne. Her di wê nûçeyê de hatiye gotin ku Rîçard Bîrîl, digel berpîrsê taybetmend yê karûbarên rojhilata navîn li wezareta berevaniya Emrîkî, Harold Rod û hin berpîrsên din, amadeyî hinek ji van civînan bûye.

Di van civînan de Bîrîl ji amadevanan re gotiyê: "hûnê dîrokê dirust bikin û wê rojê ev rojên ve hotêlê bê çêbikin."

Rojname dîsan diyar-ku di van civînan de amadevanan gelek pirsiyarên wê net ji Bîrîl kirin jibo ku ew li wan ka Emrîka heta çîroka wê ser guhertina rejîma wê li ye. Bersîva Bîrîl ji wan pirsîyan bi serokê Emrîkî re bawere ku ewê dîrokê Sûriyê nehêle.

Welatparêzî...

Welatparêzî bi ya min di siyasetê de peyvek bêtîrîn bi talûke û xijok(şemetok) e.

Jiber bê qebûlîkirinê ku tu „welatperwer e“ wê bê qebûlîkirinê ku hemû kiryarên te ji rast in, ger welatperweriya te neyê qebûlîkirinê ligel ku hemû axaftinên te wê nerast bînin qebûlîkirin, di serde tuyê „xain“ bê îlankirin.

Başê wê kî pîvanên peyvek weha tûj û bi talûke, eşkere bike?

Kîjan tevger welatperweriyê û kîjan ne welatparêziye, wê ji aliye kîja navendê ve bê diyarkirin?

Ligor kê û çî emê „welatperweriyê“ tarîf bikin?


Mixabin, bi giştî kesên ku ligel şidet û dijminatîyê bêtir „welatperwer“ xuya dikin.

Başê ma rastî eve?

Berî ku Osmanî beşdarî şerê Balkan bibe, ew kesên ku beşdariya vî şerî diparastin pir „welatperwer“ xuya dikirin.

Cemil Topuz ê ku hema hema bi tena serê xwe li dijî vî şerî radiwestiya û digot ku di vî şerî de emê birînek giran bixwin, di wan rojan de pir „welatperwer“ nedihat bîranîn.

Şerê Balkan di dîrokê de ji Osmanî re girantirîn têkçûnek leşkerî



Ahmet Altan
Gazetem.net

anî.

Gava niha em lê binerîn kî bêtir welatperwer xuya dike?

Ew kesên ku bi qîrînên coşdar şer parastin û bûn sedema têkçûnek mezîn ya leşkerî an ew kesê ku rastî got û hewl da ku civat û desthilatîyê şiyar bike?

Ji vir em digihêjin pîrsek bêtir girîng.

Gotina rastiyê welatperweriyê an ferzkirina tunebûna rastiyê ye?

Em li mekteban bi zarokên xwe re Sariqamişê, fermana Ermenîyan, bêrêtiyên di dema Ittihatçıyan de nadin xwendin.

Ferzkirina tunebûna van ras-

tiyan welatperwerî hesab dibe.

Ma welatperwerî ev e?

Rastî û welatperwerî du bêjeyên nakokî hev in?

Di ser de, me di şerê Qibrîsê de bi salan ji gelê xwe veşart ku me keşteyek xwe binav kir.

Vê rastîya ku hemû dinya zane yekî li Tirkîyê bigota wê bi hêsani bi „xaintiya welêt“ sûcdar bîba.

Başê welatparêzî veşartina vî rastiyê bû?

Ez bawer nakim ku bi veşartina rastîyan mirov dikare bibe welatparêz.

Jiber ku rastî ji holê winda nabin, her li wir disekinîn, her ku tu wê vedîşere dibe pîrsek ku her diçe mezîn dibe.

Ma vi welatî ji rastiyên ku heta îro me veşartine, fêdeyek dit?

Nod salî me mijara Ermenîyan ji zarokên xwe veşart, çibû?

Me însanan zen dikir ku hemû dinya kesên dijminê Tirkan e gîhandine.

Bi wateyekê me civak nexweş kir, em bûn netewek ku, nikare pêwendiyên saxlem deyne, ji mitefîkan ji bawer nake, bi şik li herkesî dinêre, nikare analîzên realist bike û nikare ligor berjewendiyên xwe siyasetek derve ji bimeşîne.

Ma netewekî ku hersal liber Se-

rokê Amerîkayê digere û dibêje, „ji kerema xwe re peyva nijadkujiyê (jenosîd) bikarneyne“ û jibo berdêla vî qayîle ku gelek tawîzan bide, rewşek gelek bîrmet e?

Gava hûn qebûl bikin ku welatperwerî bi rastîyan re ne lihevduine, divê hin kes hebin ku biryara kîjan rastî bînin veşartin bidin.

Ew ji her xwediyên îqtidarê ne.

Û ligor berjewendiyên xwe rastîyan berevajî dikin û vî wêk welatperwerî pêşkêşî civakê dikin.

Ew xapandine, em ji xapandina xwe welatperwerî qebûl dikin û her di nav vî derewê de digevizin (diperpitin).

Ez ji li nelihevdukirina welatperwerî û rastiyê bawer nakim.

Welatperwerî wêrekî (cesaret) divê.

Û mezintirîn wêrekî ji qebûlîkirina rastîyan e.

Hûn bextewar dibin li welatekî bîjin ku li wir kesên ji rastîyan ditirsîn û tirsonek welatperwer in?

Ji nav kesên ku rastîyan dibêjin xayîn dernakevin.

Dîrokê her nîşanî me kiriyê ku xayîn ji nav derewçıyan û tirsonekan derdikevin.

Heta ku me rastî û welatperwerî lihevdu neanîn emê li vî welatî ne rastîyan ne welatperweriya rastî bibînin.

Don't worry, be happy!

Işık Menderes Radikal

Li herêmê fila mezintirîn û xurttirîn ya qrêl bûye. Fil gava her roj bi nêrevanên xwe re diçe çemê ku nêzikî serayê xwe bişo, nebatên liser rê dibire û hewl dide ku bi lawiran (heywan) re bileyize. Nêrevanên ku lixwe heyirine çawa filê zêft bikin, di demek ku bi nêçarî difikirin ku çî bikin zarokêkî lawîk derdikeve peşîya wan. Zarok bêtirs bi xor-tîma filê girtiye û emir daye filê: "Raweste! Divê tu hêdî û bi diqet bimeşe."

Heywana girs wek ku çovekî bisêhr lê ketibe aşbûye û hêdî hêdî meşa xwe domandiye. Roja dîtir gava li eynî cî û eynî mijar dubare dibe, nêrevan şaş dibin û derdikevin hizûra qrêl û jê re behsa tiştên qewimî kirine. Qralê ku bawer nake ku zarokêkî biçûk çawa dikare filê kontrol bike, bangî wezîrê xwe dike û jê dixwaze ku mijarê vekole.

Çend rojên din wezîr rapora xwe daye: "Ezbenî, zarok bi pîrka xwe re dijî. Ji zarokên di temenê xwe de tenê ferqek wî heye, ev jî ewe ku natirse. Jiber vî ew dikare fila te kedî bike." Qralê ku serê wî tevlihev dibe, gotiyê, "Min fam

kir. Tu dixwazî çî bêje?"

"Ezbenî, zihnekî bêendîşe û bêtirs dikare her tiştî bike."

"Himm... Tu dikarî vî îdia xwe ispat bikî?"

"Beguman, ezbenî."

Wezîr demek kurt fikiriyê. Eger jê bihatibûya zarok bi endîşe bixwe, wê karibûya îdia xwe ispat bike...

Wezîr çûye serlêdana pîrka zarok kiriyê. Gava fêrbûye ku pîrê neviyê xwe bê ku ji tiştêkî bêpar bihêle mezîn kiriyê, wezîr jê rica (tika) kiriyê: "Îşev jî wek her şevê xwarina wî jê re çêbike. Lê xwê nexê. Wexta sedema wê pîrsî, jê re bêje ku jibo kirîna xwê perê me nema."

Mijar wek ku hatiye plankirin diqewime. Zarokê ku ji bersivê şaş maye, ji pîrka xwe re dibêje: „Tu meraq neke pîrê. Ezê ji te re xwê bidestbixim.“

Bi rev çûye cem dikandarê gund. „Kerema xwe hinek xwê bide min...“

Dikandarê ku fam kiriyê zarok bê pereye, jê re gotiyê ku xwê bi pereye û divê ew pere bide.

„Başê ez dikarim ji ku pere bînim?“

"Dive tu bixebitî."

"Lê ez... nizanîm bixebitim."

"Wê gavê tu nikarî xwê bistîne."

Zarok bi xemgînî vegeyriyave

malê. Pîrka wî jê re gotiyê: "Xema nexwe kurê min. Niha razê. Sibê emê dîsa vî mijarê biaxifin."

Zarok şeva xwe bi bêhîzûr derbas kiriyê û sibêha dîtir wexta diçe mektebê li ser riya xwe dîsa filê dibîne. Çûye himber filê sekiniye û jê re gotiyê: "Raweste! Hêdî û bi diqet bimeşe." Lê filê vî carê ew guhdar nekiriyê û daye ser riya xwe. Jiber ku fikra di serê zarok de tenê ev bû: "Jibo xwarina xwe ez nikarim xwê bikirim." Ev endîşeya biçûk têrê kiriyê ku hemû hêza xwe winda bike...

Ya xuya ewe ku, jiyana bêendîşe, bi xemnexurî nirxandina mijaran ne karekî hêsan e. Ji dervî zanyar û paxavnekeran (guhnedêr) herkesên ku nikarin zihne xwe rawestînin û dibin dilên (hêsir) fikran, jiber vî derdî merezdar (mustarip) in. Lê endîşeyên ji sinorên xwe derneketine û jiyana li mirov nekirine jah, jibo çaredîtina eş û astengiyan, jibo analîzkirina rewşê û stendina tedbiran û jibo tayinkirina hêl (alî,teref) û hereketkirinê dikarin bibin xwedî bandorên erênî û dehfdar bin.

Ji aliye din ve piraniya endîşeyên me xiyalî ne. Vana berhemên egoya reşbîn (pesîmîst) in. Ji tirsên di hundirê me dene derdikevin û mezîn dibin, fam-

kirina me tevlihevdu dikin, nêrînên me teng dikin û dibin sedem ku em bi pilingên kaqizî re şer bikin. Endîşeyên ku her daîm zihîn mesgûl dike û mirov hîn dike, kapasîteya xebata mirov kêm dikin, bawerîya mirov bixwe dişkinin, stendina risk asteng dike û enerjîya jiyane bi dawî tîne. Beden rojêkî ji rojan berdêla van ramanên ku mirov paralize dike û bêbiryar û neçar dihele wê bi nexweşiyên wek serêş, tansiyona bilind, nexweşiyên di sistema bexşandibûn û hezmê, westandina kronîk, astim (bêhn-tengî) ûwd. bide. Hereketên obsesîf û panîk ji îşaretên endîşeyên ku ji kontrolê derketine ku jê re alîkariya psikolojîk divê.

Bawerkirina bi qewetek îlahî, di her astengiyan de lêgerîna hêlek erênî, şikrankirina ji her çê û xirabiyên tîrî serê me, ken û piçekî bêqeydmayî, dîtina neşeya di hundure xwe de û belavkirina derûdorên xwe wê mijavî qeswet ji dora mirov bidûrbixe.

Winston Churchill dibêje: "Gava ez li paş xwe vedigerim û li endîşeyan dinerim, çiroka mirovê di nav nivînan de liber mirinêye tê bîra min. Wî gotibû ku gelek astengiyan ku peknehatibûn, derbaskirî bû."

Hêjayî fikirandinêye, ne wisa?

Jinekolog, mêrekolog, dinekolog, Prof. Dr.

Fatê Were Civatê



Şêxbat

Xaltika fatê, ez Kurdê Marasê me. Ez berê ketim nav partiya hevalan û ez weke agir pède çûm. Min da ser hev û da ser hev. Min têra xwe pere komkirin û piştê ji min got „yao de Kurdayetî bese, va min perê xwe stendin û îcar ezê dest bi ticaretê bikim. Ez serê te neêşnim, niha çend dikanên min hene û elhemdulillah halê min pir baş e. Ma tu dibê min nebaş kir? Ma tiştê belaş heye? Bi serê te ez Kurdekî yurtseverim ha! Erê min hinekî dizî kir lê, lê hêja bû! Em bi saya partiyê bûn xwedî mal û pere. Her bijî Serok!

Cihangîr Xirsizoglû / Almanya

Yahewlewela! Lao jixwe hûn Marasî ji serê min kêr bûn! Amedî, Mêrdîni, Ruhayî, Bedlîsi, Sêrtî ne bes bûn îcar ma dora Marasîyan! Ê oxlim jixwe we Marasîyan mala van partîyan xerakir û we ew li topê xistin. We bi saya van partîyan eşîr, malbat û mirîşkên xwe anîn Alamanya û partîyan ji liser piştê we kabê xwe tavêtin. We bi kampanya û xirecîrê binê xwe dagirt û hûn li mala xwe rûniştin û bûn Holding! Niha rebenê van partîyan wek generalên bê esker tizbiyên

xwe şeq-şeq dikin û xizdîza qirka wan e. Te go tiştê belaş tune? Ê jixwe tiştê belaş tune oxlim, heger tiştê belaş hebaya ma hevalan heta bi ber dixiste we hê, na! We herdu aliyan xiste hev û jihev derxist! Serok liser pista we bû pêxember û fîrya ezmana û hûn ji liser piştê wan bûn Holding! Jixwe qasidên navê ji li dû kera xwene û hîna himalîyê dikin. Lao hema jiser pista hev danekevin û jihev dernexin! Bijî xistin û derxistin!

*

Xaltika Fatê, nebixêr ez hîni vê msn messengerê bûme û hema bêje ji paltalkê dernakevim. Xwedê jê razî, hema hema piraniya koçkên paltalkê koçkên Kurdan e. Hinek ê hevalane, liber def û zîrnê bi sur dikevin û dibêjin „hey û hey, bijî û hey bijî!“ Hinek ê neteweperestane û dibêjin „M.Kemal Ocalan Kurd fîrotin!“ Hinek ê kerxaneciyanê û xeberan didin, hinek ê niqasên û mala hev dibin mîratê. Ez ji niha dixwazim koçkê bi navê „koçka nermik û germik“ vekim û anternatîfêkê ji paltalkhezan re çêkim. Ma nebaşê xaltika fatê?

Paltalkcî Mihemed / Îskandinawya

Lao Mihemedo, agir bi malê keto, ma serê te ji xelkê dêşe ker kurê kerê! Ma go ew reben nekevin paltalkê wê tekevin ku hê!? Qey tu dixwazî ew fitne û fesadiyê ji nekin! Ê lao jixwe

di destê wan de mabe mabe ziman-dirêjî maye, wê ji nekin ma wê rebena çî bikin loo? Ma piştî vê seetê naçin dest bi şerê çekdarî nakin. Teknolojî bipêşkete ye oxlim, êdî hewceyî bi çek û mekan nemaye. Çek ji di paltalk û messengerê deye û bomba atomê ji. Te go tê koçka „nermik û germik“ vekî? Naloo! Ê bi xwedê kes di koçkên xwe de namîne û wê hemî bîn koçka te. Te go çîma? Ma ne çîma Mihemedo, jixwe Kurdekanên Ewropa hemî nermik û germik bûne, ma kesekî hesin û pola nemaye! Çend kesên go hesin û mesin mabûn ji niha bûne sifir û bafûn. Lê ez ditirsim wek şahiya homoseksuelên bajarê Kölnê binin serê te haa! Wê rojê cejna wan bû û şesşed hezar nermik û germik hatibûn ba hev. Lê îcar go nermik û germik êrîşî te û kocka te bikin, wê te bidin ber xiyar û hêkan haa! De tu û nermik û germik lihev pîroz bin rebbî!

fate@peyama-kurd.com

Pêkenok


Hamsî

Kurik ji diya xwe dipirse:

- Dayê ma em hemû laz in ?
- Belê.
- Ma Kalkê min ji Laz bû?
- Belê kurê min.
- Ma bavê kalkê min ji Laz bû ?
- Belê hemû Laz bûn.
- Hema wilo be ji ez nema dixwazim bi taştê re hamsîyan bixwim, ez virikî bûm!.

Çengelpirs

Minnet, sermezîn	Brû, burh	Rastî, berbiçav	Hunermendê wêne	Meha sisiyan	Dan û stendin	Rengê	Diravî, ekonomî
					Nezewicî xort		
Sê sertipên Behram			Xirabûn Jihevdeketin				Restaurant
Beramber êrîş				Dûrişme slogan	Bajarekî Sûdî erebîstanê		
			Bin, jêr emirber	Bajar		Zewac	
Li Afrîka navê eşîrekê	Dîn, bawerî	Xeşim, cahil Notayek			Mala mirîşka		Eşkere, aîşa
				Teref, hêl, ber		Vexwarinek	
Memûrê ewlekariyê xerabûn		Şil, nerm, hêşin			Fermana rûniştinê		
		Nişana Swêdê					
			Heywanek	Toza genim	Derewîn Notayek		
			Heq, hiqûq			Jina bê mêr	Navê rojekê
			Li Kurdistanê cemek			Kanî zemba avsar	
			Xak, ax, war				
					Dengê dewaran		



Remildank



Beran (21.03-20.04)

Hûn bi xwe bawer in. Hinek bûyer zorê didin we, lê hûnê bi erênî ji bin barê giran derkevin.



Gamês (21.04-20.05)

Hûnê ji hezkiriyê/ya xwe nûçeyekê wergirin. Bernameyên nuh çêkin, ramanên we ronak in.



Cewî (21.05-21.06)

Gava hûn ramanên xwe dibêjin bi tedbîr bin. Ji herkesî re derd û me-reza xwe nebêjin.



Keşjal (22.06-22.07)

Wê hinek bûyer enerjîya we bilindtir bikin. Bêhteng nebin, berî biryarê xwe baş bipîvin.



Şêr (23.07-22.08)

Carna hûn dikevin nav xeyal û tas-wasan, lê bi kesayetiyeke xurt hûnê bi serkevin û qezenc bikin.



Simbil (23.08-22.09)

Pêşniyazên surprîz hene. Lê berî biryarê baş fikirin. Hinek bûyer guhertinan di we de çêdikin.



Mêzên (23.09-22.10)

Pêseroj we dixin nav fikaran. Projeyên nuh deynin ber xwe. Lê bizanin ku berpîrsiyarî giran e.



Dûpîşk (23.10-21.11)

His û kesayetiya xwe biparêzin. Rewşa we ya civakî û aborî bala we dikşîne ser xebatên nuh.



Kevan (22.11-21.12)

Nûjeniyê têxin nav xebata xwe. Hinek pêşketin wê we têxin nav heyecanê. Hûn tîn pesinandin.



Kovî (22.12-19.01)

Rojek xweş e. Xwestekên we bilind in, lê divê hûn ji bo van xwestekan hinekî zorê bidin xwe.



Satîl (20.01-18.02)

Wê hinek nûçe we dilşa bikin. Hinek surprîz we dixin nav lêgerînekê. Dostên we ji we hez dikin.



Masî (19.02-20.03)

Hûn dikevin nav hevîyên mezin, lê divê hûn bi aramî bilivin. Spor û seyran ji bo we baş e.

Pêkenok

Xesû

Reco tê qehwê. Ser û binê wî qetyayî, di nav xwîn û xwedanê de maye. Jê dipirsin:

- Çi bûye Reco, xêr e ?.
- Min xeswa xwe veşart, rehma xwedê lê be.
- Baş e, lê çî bi serê te hatiye ?..
- Xeswa min hinekî liberxwe da, ji ber wê!...

Şahiye çandî û civakî: Dawet

Îkram Ogûz

Berê, kîjan dê û bav bibana xwedî zarok, zarokan wan jî law ba, di roja ewil de xeyala şahîya sunet û daweta wî dikirin. Jibo hemû dê û bavan ya herî giring ewbû ku, lawên xwe di hembêza kê de sunet bikin û bi kê re bizewicînin. Daxwazên wan wek mîna dê û baven îro ne xwendinek, ne jî karek baş bû.

Jibo wê yekê piraniyan zarokên lawîn hê çavê xwe li dinê venedikirin, qedera wan dihat birîn. Dê û bavê wan bêşîga wan, yan bi ya dotmamekî wan re yan jî bi ya qîza hevlekî xwe re kertdikirin û di 14-15 salîya wan de jî dizewicandin. Ji derdora xwe re jî digotin: „Hê çavê wan venebûye, me wan serî bi go kir.“

Wexta ku zivistan destpêdikir, kar û barê gundîyan jî xilas dibû, dê û bavê xortan li derdora xwe digeriyan. Heger li derdora wan keçîkek baş heba, lawê xwe wê zivistanê dizevicandin û di payîza pêşîda jî daweta wî dikirin, tuneba li hêviya zivistanek din diman. Jibo wê yekê digotin, zivistan demsala qizxwestinê, bihara nişanê, payîz jî a daweta ye. Zivistanê qîz dihatin xwestin, qelenên wan dihat birîn, biharê şiraniya wan çêdibû. Malbata zavê heger dawîya havînê qelen tamamî bida, malbata bûkê jî dest bi haziriya dawetê dikir. Piştî haziriyê herdu alî dihatin ba hev û roja dawetê kifş dikirin. Malbata zavê, dawetnameyên xwe li hemû xwedî, nas û cînarên xwe belavdikir.

Şahiya dawetê jî ligor rewşa aboriya herdu alîyan dihat amadekirin. Heftêkî pêşda li mala bûkê hevalên bûkê, li mala zavê jî hevalên zavê, êvaran dihatin ba hev û govend digirtin. Heger mala bûkê û zavê di gundekî da ba, roja hinê, lê ji durve ba du roj berê xwendî û berbûyên zavê



li mala zavê dihatin ba hev û li hespên xwe siyardibûn û diçûn mala bavê bûkê. Li wir, xwendî li malên eqrebayên bûkê, berbû jî li mala bûkê dibûn mêvan. Roja yekem bi çûyin û hatinê ve derbas dibû. Roja diduya, bi sibetirê ve şahîya dawetê li mala kû serê bûkê dihat şustin, destpêdikir. Ber bi êvarê bûkê jî wir derdixistin û danîn mala bavê wê, dûre li wir şahî berdewam dikir û destê bûkê dihat hinekirin. Destê zavê jî li mala birazava, ji teref hevalên wî ve dihat hinekirin.

Piştî hinê li mala bûkê sinîyek jibo xelatan dihat xemilandin. Di serî de, dê û bavê bûkê û zavê, piştî berbû, li pê berbûyan jî eqreba û nas û cînarên malbata bûkê xelatên xwe davêtin ser sinîyê. Xelatên eqrebayan bi piranî zêr û pere bûn, xelatên dinê jî jibo bûkê qumaş û eşyayên malan bûn. Wexta ku dayîna xelatan diqedîya, disa govend saz dibû û heya nivê şevê berdewam dikir. Sibetirê berbû û hevalên bûkê, haziriya bûkê dikirin, berî nivro birêdîketin û berê xwe didan ber bi mala zavê. Di nav xwendîyan da ê ku siwarê hespê herî baş, qasid danî û jibo hatina dawetê zava û derdora wî agahdar di-

kir. Ji malbata zavê yekî sê şahr – sor, zer û kesk- li hev badida û li histûyê hespa qasid girêdida. Qasid jî xelata xwe digirt û şun ve vedigeriya.

Gava ku bûkê nêzikî mala zavê dibû, zave jî derdixistin ser xanî, li hêviya bûkê disekin. Ji malbata zavê jinekê jî liber derî sitilek dadanî û kevçiyek dar dida ser sitilê. Bûkê dihat ji hespê peya dibû, derdiket ser sitilê û bi lingekî xwe jî kevçî dişkand. Wê demê, zave jî liser sivderê sêva zavatiyê davêt liser serê bûkê dixist, hevlekî wî jî sahaneya ku çerez tê de, liser serê bûkê dirijand. Bûkê diket malê, zava û hevalên xwe jî birêv diçûn mala birazave. Zarokên gund perçê sêvê û çerezên rijiyabûn tovdikirin, xwendî jî ji bîrikên xwe çekên xwe derdixistin, şarjorê xwe valadikirin. Piştî bi dû zavê û hevalên wî diketin û wan ditirsandin.

Qîz û bûkê gund li ba bûkê, xort jî li ba zavê dicivîyan, govend saz dikirin û heya nivê şevê dileyistin. Hemû beşdervanên şahiyê dikişîyan malên xwe. Hevalên zavê jî zave dibirin dikirin gerdegê û vedigeriyan. Dawet jî li wir diqedîya.

Roja mayîn sandîqa bûkê dihat vekirin. Cêhêz ê ku di san-

duqê de, li xwendîya dihat belavkirin. Xelatên xwendîya, gorî eqrebatî û rûmetiya wan dihat guhartin.

Xwedîye dawetê û xwendîyan tu carî hesabê xelatan nedikirin. Carcaran gilî û gazin ji hev bikirana jî, di demek kurt de dihat jibirkirin.

Dawetên Kurdên ku li gundan dijîyan, bi kurtayî wusa bûn, ê bajêr jî ne ji wan cudatirbûn. Li welat îro jî ji bingeha wan zêde tist nehatiye guhartin. Tenê îro şûna dengbêjan teyîb û orkestra, jibo çûyin û hatinê jî, şûna hespan otomobîlan girtiye.

Lê jibo piraniya Kurdên li derveyî welêt, ev şahîya çandî û civakî bûye şahîyek wek ticarî.

Ew çawa ye?

He ger bûkê û zava herdu jî li derva bin carek, ji wan yek jî welat were, dawetê dubare dikin. Dema dawetê ne ligor rewşa aboriya herdu alîyan, ligor rewşa dawetvanan tê kifşkirin. Jibo wê yekê jî dawetên li derva di mehên biharê, an jî payîzê de çêdibin. Mesela tu kes di meha 7 û 8'an de dawetê nake.

Roja dawetê, bi mehan berê tê kifşkirin. Malbata zavê da-

wetnameyên xwe belavdike û ligor listeya dawetvanan hesabê kesên ku tene û çî xelatan tînin beri dawetê yek û yek derdixe.

Dawet di salonekê de roja Înê an jî Şemiyê, saet di 16.00 de destpêdike û di 24.00ê şevê de diqede.

Muzîka dawetê jî ligor rewşa xwedîyên dawetê Kurdî û Tirkî tevlihev, an jî tenê Kurdî ye. Lê zman çî dibe bila bibe, bê istisna muzikvan berê bi kilamê gelêrî destpêdikin. Bi hatina bûkê û zavê re diguherînin meqamê walsê. Piştî dansa bûkê û zavê hêdî hêdî bi Tirkî an jî bi Kurdî hinek kilamên tûj tînen gotin û dawî bi hinek marşên siyasi ve tê girêdan. Lê yên ku dileyîzin, tiştêkî ji wan fêhm nakin, ligor ritmê muzîkê xwe çep û rast dihejin. Piştî xelatdayinê, meqam û zimanê muzîkê tê guhartin. Heya dawîya şahiyê muzîka cingena (roman) destpêdike. Hemû kes li sahnê çiyê xwe digrin û vê carê li derdora xwe diçin tînen. Ber bi nivê şevê herkes berê xwe dide mala xwe, lê karê dê û bavê zavê heya sibê berdewam dike. Ew, mîna bûkê û zavê nakevin gerdegê, le belê karê wan daha xeter e!

Wexta ku dayîna xelatê destpêdike, mirovekî navê xwedîyê xelatan û çî anîne dinivîse, heger xelat bazin be, mirovekî din jî liser du etîketên piçûk reqemê dinivîse, yekî liser bazin dixê, ya din jî liser lista xelata, li ber navê ku kê anîye, dixîne.

Dê û bavê zavê piştî xelatdayinê xelat, listê û kasêten kamerayê digrin, berê xwe didin mala xwe. Ser masa xwe vala dikin. Teraziya zêr û makîna ku perê sexte pê tînen kifşkirin datînin ser aliyek masê! Torbê xelatan jî didin aliyek din. Lista xwe didin ber xwe. Berê bazinan yeko yek diwezînin, yên ku bazinên avzêrkirî anîne, gorî reqema ku liser bazin xistine, tespît dikin û liser kaxizekê vala dinivîsin. Dûre perê xwe yeko yek kontrol dikin. Heger perê sexte derkevin, wan jî ligor tîkiliyên xwe û dawetvanan, kê anîbe texmîn dikin û wan jî dinivîsin. Di dawiyê de kasete xwe dixin wideoyê û serê dawetê heya dawiyê seyr dikin. Bi vî awayî, yên ku bê xelat hatibin, wan jî tespît dikin.

Serê sibê, dest davêjin telefonê û ji eqrebe û nas û cînarên xwe re telefonê vedikin. Di derheqê dawetvanên ku ne bi dilê wan xelat anîne, çî ji devê wan bê tînin zimên. Roja bazarê bi vî awayî derbas dikin û daweta xwe diqedînin, lê arşîva xwe, heya roja mirinê diparêzên.



ROJBÛNA TE PÎROZ BE OJE!



Gülsüm Işık


Di temenê xwe yê 80 salan de Oje tucarî ewqas xweşik ne bûbû: Ojeyên modeya havînê...

Kleopatra jî jibo ku bandorê liser Marc Anton bike neynokên xwe sor boyax dikir. Lê di wê demê de oje wek îro nedihatîn çêkirin û wek yên îro ne xweşik bûn. Wê demê oje ji madeyên rengdar dihatin çêkirin û zindî xuya nedikirin. Oje cara yekem di sala 1925an de wek malekî îndustrî bi madeyên kimyewî hat çêkirin. Wexta cara yekem derket piyasê ji aliyê jinan ve bi eleqeyek mezin hat pêşwazîkirin.

Îro jibo jinan oje bûye malzemeyek jêneger ya xweşikbûnê. Rengên havîna îsal jibo neynokên destan cîlalîyên birqok û jibo neynokên lingan jî tonên sor û qehweyî ne.



Mêr êşa evînê dikisînin



Mêr êşa evînê dikisînin! Li gora lêkolînek kovara tenduristî ya Îtalî „Riza“, ji her çar mêran yek piştî ku pêwendiyên wî yên bi jinika bi pê re eşqê dijî diqede, dikeve bihrana ruhî. Çêtirîn dermanê êşa eşqê jî li gor mêran dîtina evîneke nû ye. Ji sedî 35ê

mêran bi bûyina bi jinek din re li riya xwe ji bîr kirinê digere.

Ji sedî 29ê mêran evîna xwe bi yên din re miqayese dike û ji sedî 11an jî birîna xwe ya evînê bi hevalên xwe re parve dike.

Li gora lêkolînê tenê ji sedî 21 jin êşa eşqê dikisînin. Jin

itiraf dikin ku ji serpêhatiyên evînê bi qawet dibin û ji bin vî bari derdikevin. Ji sedî 23ê mêr û jinan hewl didin ku varek din aşîq nebin û eşek din ji nejin.

Ji sedî 63ê mêran û ji sedî 49ê jinan radigihînin ku ji ber êşa eşqê bi kemasî carekî giriyanê.



Navenda Zelal:
Trink-Zel (Köln)
Tel.: 0221 376 24 05

Bayiyên Zelal

AKCAN GmbH
Hamburg
Tel.: 040 723 402 96

LIZA GmbH
Berlin
Tel.: 030 390 380 30

ESD Softdrink GmbH
Mannheim
Tel.: 0621 318 76 70

TRINK-ZEL II
Düsseldorf
Tel.: 0211 49 62 150

CAN GETRÄNKE
Essen
Tel.: 0201 289 74 17-18

TRINK-SEM
Dortmund
Tel.: 0231 981 86 23

HARRAN GmbH
Fellbach
Tel.: 0711 592 08 64


CHAPLIN GETRÄNKE
Bremen
Tel.: 0421 691 96 78

EURO-FRESH-FOOD GmbH
Erfurt
Tel.: 0361 26 27 516

TRINK-ZELI
Köln
Tel.: 0221 977 63 11

NERGIZ
Tel.: 02562 22 168

Amerîka: Welatê herî oldar



Amadekar: Fadil Özçelik

Ajansa Associated Press li 10 welatan di derbarê siyaseta, baweriyên olî û cudayetiya olê de lêpirsînek çekir. Encama lêpirsîne eşkere kir ku Dewletên Yekgirtî yê Amerîkayê (DYA) welatê herî oldar e. Lêpirsîn di navbera 13-26ê Gulanê de li DYA, Avûstralya, Britaniya, Kanada, Fransa, Almanya, İtalya, Koreya başûr, İspanya û Meksîka hat kirin û ji hezar kesan pirsên wek, „di jiyana însên de girîngiya olê, baweriya bi Xwedê, pêwendiyên olî û siyaseta“ hatin pirsînin.

Encama lêpirsîne welat bi welat wiha ye:

DEWLETÊN YEKGIRTÎ YÊN AMERİKAYÊ:

Lêpirsîn derdixîne hole ku li Amerîka baweriya bi olê, li gora welatên din xurttir e.

Li Amerîka ji her 10 kesan 8 kes ji Xwedê bawer dîke û eşkere dîkin ku baweriya bi olê re di jiyana wan de cîhekî taybetî digire. 2 kesan ji bersiv dane ku ew ji Xwedê bawer nakin. Her wiha ji her 10 kesan 4 kes di wê baweriyê dene ku divê alimên olî hewl bidin ku bandorê li ser biryarên hikûmetê bikin.

BRITANIYA:

Li Britaniya ol di qada siyaseta de nayê bi kar anîn û gel ji wê rewşê gazincan nake. Ji sedî 57ê Britaniyan dibêjin ku ol ji bo wan

ne girîng e. Ji her 4 kesan 3 kes dibêjin ku divê alimên olî hewl nedin ku bandorê li ser biryarên hikûmetê bikin. Ji wan hin kes ne tam zelal bin ji her 3 kesan 1 kes ji Xwedê bawer dîke. Ji 10 Britaniyan 6 kesan bersiv dan ku ew Protestan in, ji sedî 14 kes Katolik û ji sedî 19 kes jî ne oldar in.

Ji sedî 43 kesên Britaniya dibêjin ku ol di jiyana wan de girîng e, yê mayî ne di wê baweriyê de ne.

Serokwezîrê Britaniya Tony Blair wek mirovekî oldar tê nasînin. Lê Blair di axaftinên xwe de kêm caran behsa olê dîke.

FRANSA:

Her çiqas jî her 10 Frensiyan 7 kes xwe Katolik nişan didin jî, nevi ji wan ya ji Xwedê bawer nakin ya jî bersivê didin ku Xwedê nikare bê naskirin. Li gora jî her 4 kesan 1 kes jî hebûna Xwedê şik nayê kirin, her çiqas jî sedî 14 kes jî hebûna Xwedê bi şik bin jî ew îfade dîkin ku hebûna Xwedê di hindurê xwe de his dîkin.

Ji sedî 85 jî nifûsa Fransa 85 kes bi tenê naxwazin ku alimên olî bandorê li ser biryarên hikûmetê bikin. Ji sedî 63 kesan îfade kirin ku ol di jiyana wan de ne girîng e, ol di jiyana 37 kesan de jî girîng e.

Li Ewrûpa Rojava jî her welatî bêtir Misilman û Yahûdî li Fransayê dijîn. Li Frensa piştî Katolîkan, Misilman bi hejmeta xwe ya ku digihîje 5 milyonan di rêza duyem de cî digrin.

ALMANYA:

Li Almanya nayê fikirandin ku ol mijarek taybetî ye û ew li gora Amerîkayê di jiyana siyaseta de roleke kêmîr dileyize.

Ji sedî 75ên Almanan naxwazin ku alimên olî bandorê li ser biryarên hikûmetê bikin. Li gel ku gelek jî Almanan jî hêzeke raser bawer dîkin jî, neviyê nifûsa Alman baweriya xwe bi Xwedê nayne.

Di jiyana jî sedî 54 Almanan de ol roleke girîng dileyize, di jiyana yê mayî de bersiv „na“ ye.

Ji sedî 36 jî nifûsa Almanya Protestan in, ji her 10 kesan piçekî jî 3 kesan kêmîr Katolik in, ji 10 kesan 3 kes eşkere dîkin ku bi tu olekê ve ne girêdayî ne.

Serokwezîrê Almanya Gerhard Schröder wexta dest bi karê xwe yî serokwezîrtiyê kir di merasîma sonxwarîne de beşa teksta sonxwarîne ya ku dibêje „Xwedayê min alîkarê min be“ nexwend û di ser re derbas bû. Li Almanya weşanên olî di çapameniyê de kêm cîh digirin.

Li Almanya di van salên dawî de radeya beşdariya ayînen roja yekşemê daketiye ji sedî 14 an û ev reqem li rojhilatê Almanya jî sedî 5 e.

ITALYA:

Ji sedî 90ê nifûsa İtalya Katolik in û jî sedî 63 kes naxwazin ku alimên olî bandorê li ser biryarên hikûmetê bikin.

Ji sedî 80ê jî İtaliyan îfade dîkin ku ol ji bo wan girîng e û jî her 3 kesan 2 kes jî Xwedê bawer dîke.

İtaliya yek jî wan welatên Ewrûpayê ye ku di derbarê kurtaşê de xwediyê yasayên (zagonên) liberal e. Di sala 1981an de bi referandûmekê gelê İtalî jî bo îptalkirina yasaya kurtaşê li dijî pêşniyariya Vatîkan derketibû.

Di sala 1974an de jî İtaliyan, li gel nerazîbûna Vatîkanê yasaya hevdûberdanê jî pejirandibûn.

ISPANYA:

Wek Almanya, Fransa, Britaniya û İtalya li İspanya jî piraniya gel, jî sedî 75an zêdetir li dijîn ku alimên olî bandorê li ser biryarên hikûmetê bikin. Ji her 5 kesan 4 kes xwe Katolik dide naskirin, lê jî sedî 46 kes dibêjin ku ol di jiyana wan de girîng e, jî sedî 52 kes jî ne li ser wê fikrê ne. Li welat neviyê nifûsa Katolîkan kêm caran diçin ayînen yekşemê. Ji sedî 50 kes eşkere dîke ku jî Xwedê bawer dîkin û jî sedî 20 kes bawer nakin. Ji sedî 17 kes jî hebûna hêzeke raser bawer dîke.

AVÜSTRALYA:

Li gel ku piraniya hemwelatîyên Avûstralya xwedî baweriyek olî ne, tercîh dîkin ku karê û barên olî û siyaseta jî hevdu cuda bin. Ji sedî 75 kes li dijî radîbin ku alimên olî tîkilî karên hikûmetê bibin, jî sedî 22 kes jî difikirin ku ev dikare bê qebûlînin.

Nêzîkî neviyê nifûsê jî olê bawer dîkin, jî sedî 11 kes bawer nakin û jî sedî 23 kes jî hebûna hêzek raser bawer dîkin. Piçekî jî neviyê nifûsê bêtir dibêjin ku ol di jiyana wan de girîng e.

Papa Jean Paul II di axaftîneke xwe de, rexne li Avûstraliyan kiribû û ew bi wê yekê tawanbar kiribûn ku li şûna çûyina dêrê, li sporê temaşe dîkin.

KANADA:

Li Kanada, jî Amerîkayê bêtir baweriya cudabûna Dêrê û dewletê heye. Ji sedî 72 hemwelatîyan di wê baweriyê de ne ku divê alimên olî hewl nedin ku bandorê li ser biryarên hikûmetê bikin.

Ji sedî 64 Kanadî difikirin ku ol di jiyana wan de girîng e. Piraniya gel jî xwedê bawer dîkin, jî sedî 12 bawer nake û jî sedî 24 kes jî hêzeke raser bawer dîkin.

Nifûs jî sedî 25 Katolik û jî sedî 14 Protestan e. Ji sedî 25ê nifûsê eşkere dîkin ku ew endamên ba-

weriyên olî ne, jî her 5 kesan 1 kes jî xwe weke ne oldarnîşan didin.

Nisbeta Yahûdî û misilmanan li vî welatî gelekî kêm e.

Li Kanada siyaseta medar di axaftin û daxuyaniyên xwe de kêm caran navê Xwedê tînin ser zimanên xwe.

MEKSİKA:

Li Meksîka jî sedî 80ê nifûsê Katolik e û jî sedî 89 kes jî Xwedê bawer dîke. Hejmara ateîstî ew kesên ku dibêjin hebûna Xwedê nikare bê zanîn di sedî 2an de dimîne. Ji sedî 4 kesên Meksîkî jî hêzeke raser bawer dîke.

Ji sedî 75 Meksîkî li himber radiwestin ku alimên olî tîkilî nav karûbarên dewletê bibe û jî sedî 60 kes eşkere dîkin ku ol di jiyana wan de roleke girîng dileyize. Ji sedî 25 kes dibêjin ku heta radeyekê ol di jiyana wan de girîng e û jî sedî 15 kes jî dibêjin ku gelekî kêm an qet ne xwedî roleke.

KOREYA BAŞUR

Li gel ku alimên olî di pêvajoya demokrasiya Koreyê de roleke girîng leyistin jî, jî sedî 68 kesên Koreyî ne pê re ne ku alimên olî di biryarên hikûmetê de xwedî bandor bin.

Ji sedî 63 kes eşkere dîkin ku ol di jiyana wan de roleke girîng dilîze û jî sedî 45ê nifûsê jî Xwedê bawer dîke. Ji sedî 25 prosent eşkere dîke ku ateîst e an mirov nikare hebûna xwedê zanibe û jî sedî 12 bawer dîke ku hêzeke raser heye. Ji sedî 15 kes dibêjin ku ew carna jî hebûna Xwedê bawer dîkin.

Ji sedî 34ê nifûsê Mesîhî ne, jî sedî 24 Bûdîstin û jî sedî 49 radi-gihînin ku ew ne mensûben olekê ne.

Li Koreya başûr di salên 1970 û di salên 1980 an de di tekoşîna li dijî hikûmetên otorîter û rejîma leşkertî de rahîben Katolik û keşeyên Bûdîst di nav hêzen demokratîk de cîh girtin û di pêvajoya demokrasiyê de roleke taybetî leyiztin.



Mesûd Barzanî û Celal Talabanî piya kombiyayîşî çapamenî viraşt



Dûkan - 2î temmuz de polit-buro û komiteyî navendî ê PDK û YNK binî serekîtiye Celal Talabanî û Mesûd Barzanî de Dukan de amê piyehet.

No kombiyayîşa pey serekî dewleta Iraq Celal Talabanî û serekî kurdistan Mesûd Barzanî yew kombiyayîşî çapamenî de derheqî no kombiyayîş de aghadarî da

rojnawewanan.

Îta hêverî serekî kurdistan Mesûd Barzanî qisêkerd. Mesûd Barzanî, ma ewro semedî qisêkerdişî persanî xo amê piyesser, va û qisêkerdişî xo îna rûmna; „Ma no kombiyayîş de yasayabingehîn ê dewleta Iraq, yasayabingehîn ê kurdistan û yewkerdişî her di hukmatan ser qisêkerd. Ez zaf kêfweşa

ke ma heme persan de sey ciye fikirîni. Ma semedî çarekerdişî nê persan qerari muhim giroti“.

Mesûd Barzanî ya pey Celal Talabanî qal girot. Celal Talabanî zi, se ke Kek Mesûd zi ard ziwan, ma heme persan de hemfikirî, va û qisêkerdişî xo îna rûmna; „Gereka maddeyî 58. ê yasayî Iraq yew ling lez biyero ca. Çi qanûn

ke Kerkûk alaquadar kenî, gereka yew ling ro biyerî tetbiq kerdiş. Se ke kek Mesûd zi ard ziwan, ma semedî yew Iraq federal, demokratik û zafren-gina xebatê xo birûmni“.

Semedî yewkerdişî her di hukmatan zi yew komîsyon ame vîcnayîş. No komîsyon nêzdî de xebatê xo biqedno û netice bido serekî kurdistan Mesûd Barzanî.

Komitê navendî ê PDK-Î ame piyesser



Kur- distan - PDK-Î 20î heziran de bi hedrebiyayîşî piyerê endamanî esli, çagirîti û şewirmendan a kombiyayîşî komiteyî navendî viraşt.

Kongreyê 13. na pey


no kombiyayîşî 5. ê komitê navendî bi.

PDK-Î no kombiyayîşî xo de halî aktuel ê rojhelata bênatin û kurdistan ser; vîcnayîşî serekkomarî Iran ser vindert.

Kombiyayîşa pey parti semedî rayaperoyî ya yew vilavok kerd vila û îta de biyayani aktuel ser vîcnayê parti eşkera kerd.

PDK-Î idîa kena ke serekkomarî Iran Mahmud Amedinecad qetilkaranî Dr. Abdurrahman Qasemlo ra yew o.

Çolîg de taye kesan eriş berd IHD ser



Çolig - 4î temmuz de Çolig de taye kesan eriş berd komele heqî merdiman(IHD) şubeyî Çolig ser.

2î temmuz de trena ke bênatê Xarpêt û Tetwan de sefer virazena, nêzdî Dara Henî istasyonê Suveren de ginay yew mayin re. Tren rayer ra veciyay û qeldiyay,

na tren de 6 kesî merdî û 8 kesî zi bî darbice.

Semedî nê kesana 4î temmuz de Çolig de yew merasim viraziyay. Na merasima pey taye kesan berî komelê IHD şikitî û kotî zerre. Inan komel de pencerê û computer şikitî û remayî rêça xo kerd vîn.



Selim Çürükkaya

Merdimo ke xinciyerê egîdê est erd

Mi kitabî Şemdin Sakik 2 rojî de wend. Ez yew roj no kitabî ser fikirîyaya.

Ge-ge mi xo kerd herindê Ocalan û ge-ge zi mi xo kerd herindê Şemdin. Ez no qede nê kitabî ser vinderta.

Mi destî xo na vîcdanî xo ser û no kitabî de çend çî tespît kerdi.

Nameyî kitabî: „APO“

Nustox: Şemdin SAKIK

Wewanxane: ŞARK YAYINLARI

Mi heta nika şexsî Şemdin Sakik nêdiyo. O 18 serrî heme lejan de serkote bi. Labelê o îmtihano peyin de sinif de mend. Ey nasnameyî egîdê est erd, ey bi destî xo penî xo ard. Heyatî ey sey trajediyane Shakespeare tiyemyankote û girift o.

Serrê 1993 de wext ke ez zindananê APO de binî çiman de biya, yew kitabî Şemdin kot mi dest. No kitab Şemdin nuştib, la nêame çapkerdiş. Mi no kitab wend, ez ecêb menda. No kitab de şerî gerilla ser zaf hol aghadarî bi.

Mi va:

No merdim sey Gîlap yew merdim o. Yew kes ke keye Ocalan de mendiyen, ey va:

Gueş pa mekuir, talike yew merdim o, o xo keno herindê serekî.

Mi ca de zûna ke awê ey giriyaya. Mi kitabî xo „Aponun Ayetleri“ de behsê Şemdin kerd.

Ez ameya Almanya, bênate ra çend serrî viyertî. Keye mi Duisburg de bi. Yew roj serî sibay mi TRT-INT de xeberî guedarî kerdiyen. Ez pê hesiyaya ke Şemdin Sakik remawo û xo eşto bexdî PDK. Cîni mi telefonî mesulî PDK ê Almanya Dilşad Barzanî kerd. Ma Dilşad ra telefonî Şemdin girot. Mi Şemdin de qisêkerd. Mi ti ra va:

Eger tu wazenî biyerî Ewropa, ez eşkena to re ardim bikerî.

Şemdin va:

Nê! Ez nêwazena biyerî Ewropa. Eger ez pa yew grubê xo biresnî koyanî Amed û ez yew serr koyan de bimanî; Apo het kes nêmaneno.

Ey mi re rica kerd, va:

Ti eşkenî xebêrî bîdî BBC û yew heyetî rojnawewanan bişawi îta.

Mi bênatê ey û BBC de alaqa na rue. Kovara Der Spiegel re yew grub xo kerd hedre ke şero û ey de roportaj vrazo, la no bênate de Şemdin tepîşîya.

Çi gune ke o bî îtirafî, ey xinciyerê camiyerdê est erd. Ez eşkena kitabî ey bi yew cumle kilm bikerî.

Ê çiyani ke Şemdin derheqî Ocalan de vîno piyerê inan raştî, labelê ê çiyani ke o derheqî Mustafa Kemal de vîno, piyerê inan zurî.

Kilmexberî

Suriye de lej veciya, 1 kes merd, 3 kesî bî darbice



Şam - 4î temmuz de nêzdi Şam de bênatê hêzanî emnîyêti suriye û yew grubê insanen de şer veciya. Yew serleşkerî suriye kişiya û 3 eskerî zi bî darbice. Nayê ser Şam de zaf merdim gêriyay bin dêst.

Goreyî ajansî suriye Sana na yew gruba terorîst a û myanî inan de heskerdê Saddam Husen estî.

Çolig de yew merdim bêwihar dere de xêniqya

Çolig - Çolig de kiştê dere Xêyd de yew mehîr veciya orte. Hefte ku viyert poles kiştê pirtî Xeyd de yew mehîr di. Cuwa pey veciya ortê ke no mehîrî Uzeyîr Ozcan o. Uzeyîr Ozcan 62 serre û yew merdim bêwihar bi. Poles mehîrî Uzeyîr Ozcan berd nêweşxaneyî dewlet ê Çolig.

Heyetî FKKS ho Kurdistande o



Hewler - Yew mude cuwa ver yew heyetî Federasyona komelên Kurdistanê li Swêd (FKKS) kurdistana Azad ziyaret kerd. No heyet bin serektîyê serekê FKKS Şermin Bozaslan de 4î temmuz de Parlamentoyî kurdistana federe de cagirote Parlamantoyî Dr.Kemal Kerkûkî ziyaret kerd.

Bênatê Pasdaran û şarî Merîwan de lej veciya

Merîwan - 2î temmuz de bajarî kurdistana rojhelat Merîwan de, meydana „Şebreng“ de bênatê pasdaranî İran û şarî Merîwan de lej veciya. Goreyî agahdariya pel keye ê Yekîtîya Şoresgerên Kurdistanê pasdaranî İran meydana Şebreng de erîş berd tolaçiyani seyar ser. Nê tolaçiyani seyar no meydana de kasê û çî bin ruetiyan. Pasdaran eşî inan ser û her çî inan erd ra raşûna. Naye ser inan zi xo verda, no qede bênatê pasdaran û şarî de lej dest ci kerd. No lej de zaf kesî bî darbice.

Kurd wazenî dewleta tirk bidî mehkima

Amed - Kurd-Kom 28î hezîran de samedî virardişî serekani tevgera netewî ya kurd ê 1925 yew konferans viraşt.

Na konferansa ke Amed de ame hedrekerdiş pê namê Kurd-Kom İbrahim Güçlü qisêkerd. İbrahim Güçlü sebebani serewedartişî 1925, armançani na hereket û qetliami dew-



leta tirk ser vindert. Hancî Kurd-Kom no derheq de yew vilavok kerd vila. Kurd-Kom wazena

samedî idam kerdişî 47 serekani kurd û qirkerdişî şarî kurdistan dewleta tirk veco verî mehkima.



Heyetî PDK û YNK bi Komîsyonî Qanûna amê piye het

Hewler - 3î temmuz de heyetî YNK û PDK bi komîsyonî Qanûn ê Parlamentoyî kurdistana amê piyehet ke samedî kombiyayîşî 4î hezîran xo hedre bikerî.

Goreyî agahdariyanî endami heyetî PDK Felekeddin Kakeyî no kombiyayîş de caardişî maddeyî 58. ê Qanûnî rayerraberdişî dewleta demî, çarçeveya sistema federalî de alaqaşî kurdistan bi hu-

kumeta Bexdat re û awankerdişî hukmato yewbiyaye ê Kurdistan ser xebat amê kerdiş.

Heyetî YNK Nûşîrwan Mistefa, Saadî Ahmed Pîre û Mela Bextiyar, heyetî PDK zi Fazil Miranî, Kemal Kerkûkî û Felekeddin Kaki ra amebi meydan

Sekreterî Parlamentoya Federe zi torî no kombiyayîş bi.

Parlamentoyî Almanya penî hukmatî SPD-Keskan ard

Berlin - 1î temmuz de waştêyî serek hukmatî Almanya Gerhard Schröder ser Berlin de Parlamentoyî Almanya de samedî hukmatî Sor-Keska vengdayîşî bawerîye viraziya.

Neticê no vengdayîş de parlamentoyî Almanya nêbawerî samedî Schröder û hukmatî ey da. Se ke yeno zanayîş vîcnayîşî Parlamentoyî eyaletî NRW de SPD iktidar ra kot. Nayê ser Schröder waşt ke hukmatî ey bikuro û aşmê elûl de vîcnayîşo newe viraziyo.

No samed zi 1î temmuz de parlamento de samedî hukmatî Sor-Keska vengdayîşî bawerîye viraziya. No

verngdayîş de 151 parlamenterî Schröder re bawerîye xo eşkira kerd, 296 parlamenerî bêbawerîya xo eşkira kerd û 148 parlamenter zi bêveng mendî.

Se ke yeno zanayîş serekî fraksiyonî SPD Muntefering gazi parlamenteranî partiye xo kerdib ke ey bêveng bimani.

No dengdayîşo pey Almanya de rayeri vîcnayîşanî Parlemntoyî federal abi. La lazimo ke verî serekkomar Kohler Parlamentoyî fesih bikero. O qede yeno tehmîn kerdiş ke Kohler zerrê yew heftî de Parlamento fesih bikero û no qede aşmê elûl de vîcnayîşo newe viraziyo.

Halî tirkîya û fasîzm

gotar

Hespî Aydın

No demo peyin de samedî ameyîşî Faşizma tirkîya de şerti estî yan zi çini yeni minaqasha kerdiş. Taye samedî zaf wendişî kitabî Hitler "Tekoşina mi" tirkîya de sey yew şerti Faşizm vinenî. Heq waştîşî kurdan û vînayê xo vatişî entelektuelan re tehemûl çino. Ters û bêhuquqê, serobin biyayîşî qaideyan bû zaf, huquq niyeno say kerdiş. Tebaqaya lumpen-proleter (tebaqaya bê kar û vîşanan) tirkîya de zafa. Tebaqaya Burjuvazî ya qic zi tirkîya de heyatî xo re memmûn niya, vernî xo re tersena.

No hal û ehwalî gel hetî serekani hukmat û ordira yeno manipule kerdiş. Hilmi Özkök samedî kirdana va "sözde vatandaş". Na politika kî eşkeno bi National Sosyalistanî almanya ya wextî 1930 a miqayese bikero. Çimki inan zi yahudiyan ra vatiyen: "Mileta waharî kulturî xirab".

Ser hukum ameyîşî piyere Faşist rejiman de tebaqaya bênatin yew rolo gird kaykerdo.



Faşizm her ca de heverî destekî na tebaqa gena û inan organize û mobilize kena. Na tebaqa hetani peynî rejimanî Faşist zi roli xo kay kena. Hitler kitabî xo ye "Tekoşina mi" de ina nuseno: "Tebaqayî bênatin samedî ciwiyayîşî yew dewleta zaf muhim a".

Pê ardîmî na tebaqaya Nasyonal-Sosyalistan almanya de serani 1929 - 1932 de krizî Kapitalizm de bî engelî şoresî civakî (toplumsal). Na tebaqa seni ke hostayan vato "qaypak tebaqa ya û bênatê sinifê karkeran û burjuvazî de ca gena. Nê zaf lez yeni xapînayîş. Nê zaf tersinikî û zaf giredayê otorite ye. No rid ra Hitler eşka inan ser hukum xo birumno û inan samedî menfaati kapitalistanî girdana mobilize bikero. Verî herbi dinya ê didin ewropa de pancas milyon insanî bê kar bi, vîşune zaf bi. Milet bênatê sosyalizm û barbarê de tercih kerdiyen. Faşistî almanan heverî tebaqaya bênatî û zaf cuwa pey zi sinifê karkeran pê şaranî çepana qezenc kerd û samedî menfaati finans- kapitala kerd alet. No qede faşist ewropa de bî sebebî qetilkerdişî pancas milyon insan.

